

POP KURD

05/2020 • Jimar 7

e-Kovara Populer Kulturê

“HEQÊ ME TI
KESÎ TUNE YE EM
JI GUHDARÊN
MUZÎKA KURDÎ
GAZINCAN BIKIN”

TARA MAMEDOVA


ÛSIV | POZHILDANA KURDÎNÛSAN Û
BERXWEDANA TIRKÎNÛSAN



GULESRA | LÎKORA KURMANCÎ



Murat Özyaşar | PoPirs



Merheba û silav PopKurdhezên xweşik û delal!

Me gelekî bêriya we kir. We jî dipirsî: “Ka POPKURD li ku ma? Em li bendê ne?” PopKurd her diçe bi we xweştir û geştir dibe. Me xwest em hejmareke bi dilê we hazir bikin û va ye gula civatan, kovara we POPKURD bi hejmara xwe ya 7emîn li ber ‘tiliyên’ we ye.

Di van rojên xirab de ku hemû dinya bi belaya vayrosa koronayê ketiye, em hêvîdar in bi e-kovara me, bêhna we piçekê derkeve. De bifermin!

Not: Nivîskarê me Mihemed Bîlen (Rihletguzîn), qezayeke cidî derbas kir û loma jî di vê hejmarê de nikaribû binivîse. Rewşa wî niha baş e û silavên wî li we hemûyan heye. Em car din jî birêz Bîlen re şifaya xêrê dixwazin.

POPKURD
05/2020 • Jimar 7

Edîtor


Mistefa DOGAN
Ömer SÖNMEZ

Alîkarê Edîtoran

Ridwan XELÎL

Rûpelsazî

GrafîKURD



NAVEROK

04

Ey Kurdino!
Ayşenûr Ozel

07

Şanogerên Kurd Dipeyivin
PopKurd

15

Couchsurfing 101: Seba Cimeata Gerokan
Biraîmê Mîrekî

17

Meydan e!
Nivîskar Û Xwîner Hevdu Rexne Dikin

20

Lîkora Kurmancî
Gülesra Güllü

22

PopPirs: Murat Özyaşar
PopKurd

24

Gelo Kurdbûn Goşt e ku Hinek Kurd Naxwazin Bixwin?
Şêx Zelala Ji Fînê

29

Komîsyona Kurdî ya Boğaziçiyê

34

Roportaj: Tara Mamedova
Gernas Nenas

38

Me Ji 10 Kesan Pirsî
Popkurd

42

Pozhildana Kurdînûsan û Berxwedana Tirkinûsan
Ûsiv

44

Xem û Edeba Kurdî
Ronya

45

Travma û Vîrusa Koronayê
Prof. Dr. Jan Ilhan Kizilhan

Ey Kurdino!



Aysenur Ozel

Ey Kurdino!

Çay û qehweya xwe hildin û werin ez ê qala mijareke ku min gelekî aciz dike bikim ji we re. Min xwest ez di vê hejmara POP-KURDê de derdê dilê xwe binim zimên.

Hûn jî dizanin ku axaftina bi Kurdî -çima wisa ye tu carî nikarim fêhm bikim- wekî tiştêkî şerm tê dîtin. Gava ku em bi zimanên din diaxivin xwe nûjen dibînin. Em xwe wisa şêrîn, wisa kubar, wisa nazik dikin, tu dibê qey di vê dinyayê de ji me kubartir û şêrîntir tu kes tune ye. Lêbelê em rastiyan nabînin an jî naxwazin bibînin. Axaftina bi Kurdî her ku diçe zêde dibe lê ji aliyekî ve jî kêmtir dibê. Gelo ji ber çî wisa ye? De werin em hinekî li ser vê bifikirin û bipeyivin. Bi rastî gelek sedem hene ku em zimanê xwe xweş nabînin û jê şerm dikin lê sedema herî mezin -bêguman ez ê nebêjim bêdewletî ye- xwenasnekirin e. Gava ku meriv ziman, dîrok û çanda xwe yanî bi kurtasî gelê xwe nas dike pirtir ji zimanê xwe an jî bi awayekî din bibêjim; ji xwe hez dike. Belkî hûn ê bibêjin “Keçê meriv çawa ji zimanekî wekî Kurdî hez neke?” lê mixabin yê hez nakin û jê şerm dikin jî gelek in. Erê gelek in. Mixabin em Kurd bi zimanên din hebûna xwe dixemilînin lê ew xemilandin belkî ji dûr ve xweş tê ber çavê me; wekî din xemilandineke bêwate ye. Nûjenhîskirina bi zimanên din jî li gorî min wisa ye. Ez jî wekî Kurdên ji welat, gel û zimanê xwe dûr, di nava gelên din de mezin bûm lê gava ku min Kurdek didît baş lêkolîn dikir ku Kurdek çawa ye. Axir min di zarokatiya xwe de gelek Kurd nas nekirine, hema wisa min li wan dinêrî û dixwest ez wan nas bikim. Mixabin gava ku min ew nas kirin, min dît ku li ser axaftina bi Kurdî qet ji xwe bawer nîn in û xwe vedişêrin an jî ji ber hin tiştan dev ji zimanê xwe ber didin û bi zimanên din didin û distînin. Qet ji bîra min naçe; gava ku ez li dikana bavê xwe dixebitîm, çend keçikên Kurd ên ji Bakûrê Kurdistanê dihatin, tişt distendin û bi min re diaxivîn; digotin em Kurd in. Min jî ji dilê xwe digot, çawa xweş e even hanê niha li mala xwe fenanî bilbilan bi Kurdî qise dikin. Ez jî wê gave 13-14 salî me, qet nizanim ku rewşa zimên li Kurdistanê çawa ye. Paşê ez hîn bûm ku haya wan keçikên ku dihatin dikana me ji Kurdî jî tune ye. Çi tiştêkî xerab e ne wisa?

Çima em bi zimanê xwe naştexilin? Ji ber ku em qîmetê nadin xwe, em ji xwe hez nakin. Hînbûn û axaftina bi zimanê dayikê, bi taybetî bi hezkirinê çêdibe delalno. Hûn ji xwe hez bikin ku ji zimanê xwe jî hez bikin. Erê belkî ji aliyê gelek tiştan pirs-girêkên me hene lê em bi Kurdî biaxivin, dikarin rê li ber hîn pirs-girêkan jî bigirin. Heke em li mala xwe jî neaxivîn îja em ê li ku xeber bidin ma ne wisa?

Em xwe biçûk dibînin li hemberî gelên din lê em nizanin ku em bi Kurdî bedewtir, şêrîntir û nûjentir in. Keçikno! Dilê xwe nekin lê ev nûjenhîskirina bi zimanên din li cem we jî gelek zêde ye. Dilê xwe nekin ha ev rastiyeke e ku ez dibêjim. Belkî em ê rojekê bibin dayik û bav. Li ser mezinkirina zarokan tesîra bavan çî qasî zêde bibe jî bandora dayikan zêdetir e. Gava ku em axaftina bi zimanê xwe, wekî tiştêkî şerm dibînin, di rastiyeke de bi destê xwe em jiyana zarokên xwe jî xerab dikin. Ew zarok çend sal şûn de wê mezin bibin û gazinan jî dê û bavê xwe bikin ku çima bi zimanê xwe ew mezin nekirine. Bi vî awayî jî têkçûyîna miletekî dest pê dike û bi salan berdewam dike. Herwiha em çiqas têk diçin ewqas jî di paş de dimînin. Ji ber wê dibêjim divê axaftina bi Kurdî yanî jixwehezkirin nebe tiştêkî şerm. Bi rastî min hinekî dereng zimanê xwe nas kir, hinekî dereng bedewiya Kurdî dît lê min fêhm kir ku em bi rastî jî xwedî zimanekî gelekî xweş in.

Erê em hatin dawîya bernameya xwe; hûn bi xêr û silametî hatin. Derd û kulên me Kurdan gelek in, tenê bi çay an jî qehweyekê xelas nabin, hûn jî baş dizanin. Ez naxwazim we zêde meşqûl bikim. Wekî keçikeke Celalî tîm destê mezin, rewşenbîr, hunermend, nivîskar û zanyarên me û spasiya malbata POPKURD'ê dikim ku derfet da min ez derdê dilê xwe bibêjim. Ha ez wê jî ji bîr nekim û bibêjim: Kurdino! Ji cudatiyên hev hez bikin û bibin yek.

Bi Kurdî û Kurdistanî bimînin.

dûreders

Ji Kurdê dâr nemînin

 kurdishdureders@gmail.com  [@dureders](https://twitter.com/dureders)  [@dureders](https://www.instagram.com/dureders)

PIRSÊN BO ŞANOGERAN

-1-

Tu ji şanogeriya kurdî dikarî
pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

-2-

Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî
çi ye?

-3-

Dema tu karê xwe dikî,
herî zêde çi te aciz dike?

-4-

Tu ji ast û hejmara temaşevanên
şanoya kurdî razî yî?

-5-

Di şanogeriye de xeyala te
ya herî mezin çi ye?



ALAN CIWAN

Alan Ciwan di sala 1990î de li Batmanê ji dayik bû. Di sala 2005an de li Batmanê dest bi karê şanogeriye kir. Di sala 2009an de çû Stembolê û xebatên xwe yê hunerî bi zimanê xwe yê zikmakî -Kurmancî- berdewam kir. Bi lîstika xwe ya bi navê “Di Tuwaletê De” di warê lîstikvaniyê de, çendîn xelatên girîng wergirtin.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Dikarim pere qezenc bikim lê nikarim pê debara xwe bikim.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Bi wateya xwe ya herî xwerû; kultur. Şanoya kurdî jê re dem divê ku heta ji statuya “berpirsiyariya neteweyî” ber bi bûyîna çandekê ve bimeye. Divê zarê kurdî û rêbazên şanoyê pêk ve rengêkî, dengêkî

Biafirînin da bibe şanoya kurdî.

Divê temaşevanên wê ne ji bo xatirê heval û zimanê kurdî werin seyra wê. Ne ji bo alîkariya şanoya kurdî bilêtên xwe bikin. Pêwistiya şanoyê ne bi bîner û guhdaran, lê bi şopînerên xwe heye.

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?

Dema ez karê xwe dikim tu tişt min aciz nake. Dema ez karê xwe nakim aciz dibim. Dema neçar im ji dêvla karê xwe, şiyana xwe û hêza xwe bi tiştêkî dî re xerc bikim. Tiştêkî ku ne ji min û ne jî ji dilê min tê.

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?

Meseleya astê ne heddê min e ku tiştêkî bibêjim. Hejmar kême. Lê ez şanoya xwe li kû dikim, çawa dikim? Ev bandoreke mezin li ser hejmara temaşevanan dike. Ev bandoreke mezin li ser asta temaşevanan dike.

Dawiya dawî mesele tê û diçe dimîne li ser asta me xebatkar û afirînerên vî pîşeyî. Dimîne li ser ciyê ez lê lotikan didim.

5- Di şanogeriye de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyala min a herî mezin ew e ku bikaribim bibim çîrokbêjek. Dû re bibim çîrokbêjekî pak. Dû re kî zane dibe ku bibim yekî baş jî.





Berfîn ZENDERLÎOĞLU

Ji beşa Rexnegiriya Tiyatroyê û Dramatûrjiyê” ya Zanîngeha Stenbolê mezûn bûye. Di kovara Edebiyatê ya Jiyana Reşen de xebitî. Di 2008an de tevî Mîrza Metîn Destar Theatre ava kir. Lîstika ku herduyan nivîsî bi navê “Reşê Şevê” ji weşanxaneya Avestayê, him bi Kurmancî him bi Zazakî derket. Di sala 2010an de pêşengiya avakirina Şermola Performansê kir. Heta niha di gelek lîstikan de derhênerî kiriye. Zenderlioğlu niha jî wek lîstikvan, derhêner û nivîskar xebatên xwe didomîne.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere gezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Gava hola Şermola Performansê hebû me debara xwe bi şanoya Kurdî dikir. Ji ber ku repertuara me hebû, heftê 3 caran lîstikên Kurdî dihatin lîstin. Lê mixabin me ji ber hin sedeman dev ji sehneyê berda, helbet ew derfet jî ji destê me çû. Ez niha jî debara xwe bi şanoyê dikim. Carinan karê dublajê jî dikim. Di zanîngehekê de darsa lîstikvanîyê didim û herwiha ji bo şanoyên cuda derhêneriyê dikim. Lê dikarim vê bejîm: mixabin ez debara xwe, niha bi şanoya Tirkî dikim.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Ji bo xebatên bi rêkûpêk/profesyonel divê saloneke we hebe. A din jî ji bo aktor û aktrîs bi rehetî bikaribin karê xwe bikin hewce ye bingeha aborîyê were çareser kirin. Divê bazara şanoya Kurdî pêk were ku xwestek û daxwaz zêdetir bibe. Siyasetmedarên me her tim qala ziman, çand û hûnerê dikin lê mixabin ji vê hişmendiye dûr in. Ku em li polîtîkaya wan a çand û hûnerê binêrin em ê vê nakokiyê baştir bibînin.

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?

Bi salan e ji bo şanoyê kedê didim. Lîstikvanên zêde zêde jixwebawer, tiral û bêdisiplîn, îmana min ji wan diçe. Jixwe careke şûn de bi wan re naxebitim. Ji ber ku ez qîmet û rûmetê didim karê xwe. Naxwazim û nahêlim jî kes hêza min bişkîne.

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?


Divê em rê û rêbazên alternatîf bibînin ku xwe zêdetir bigihîjînin temaşevan. Ez bi xwe li Stenbolê dijîm. Ev der metropoleke mezin e û nifûsa Kurdan jî li vê derê gelek e. Em di lîstikên Şermola Performansê de her tim jorîvîsa Tirkî û Îngîlîzî bi kar tînin da ku zimên ji bo kesê ku kurdî nizanin nebe pirsgerêk û bizanibin şanoya Kurdî niha di çi astê de ye. Dikarim bêjim temaşevanên me %40 ji kurdan, %60 jî ji bîyanîyan pêk tên. Mixabin hê jî di nav Kurdan de çandê wisa rûnenîştîye. Ev girêdayî polîtîkaya Tirkîyê ye jî. Zimanê Kurdî hê jî nayê qebûl kirin. Heke tu bi awayekî serbixwe karê şanoyê bikî karê te hîn zehmettir dibe. Heqê bilêtên me buha tên ji bo

temaşevanan. Lê em mecbûr in, wekî din tu derfeta me tune ye. Helbet temaşevanên me yên ezîz jî hene ku li benda lîstikên me ne. Em bi 'inyad û bi hêvî di nav van şert û mercan de hunera xwe pêk tînin. Ji bo razîbuna dilê xwe em dixebitin.

5- Di şanogeriya de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyalên min pir in. Lê li gor min in, biçûk in. Carna diguherin. Carna tenê wek xewn û xeyal dimînin. Lê dîsa jî xeyalkirin ji bo min hebûna kesayetiya min e. Ne ewqas mezin in ku ez ji we re bêjim. Gava ku ez pêk bînim ji xwe dê eşkere bibin û hûn ê jî dê bibin parçeyekî wê. Heta niha min çi kiribe, tê de jixwe lipeyketina şopa xeyalên min hene.





MÎRZA METÎN

Di sala 1980yî de li Kaxizmana Qersê ji dayik bû. Di navbera 1994-2003yan de, li Teatra Jiyana Nû perwerde bû û di lîstikan de lîst. Di sala 2008an de, tevî Berfîn Zenderlioğluyê, Şermola Performans ava kir. Di 2017an de li Zanîngeha Stenbolê, beşa Rexnegiriya Şano û Dramaturjiyê kuta kir.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Îsal bû 25 sal ku ez bi şanoyê re mijûl im. Nêzî 15 sal in jî ez debara xwe bi şanoyê yanî bi hunerê dikim. Ji şanoya Kurdî jî, ji ya Tirkî jî, ji ya Elmanî jî dikarim pereyan qezenc bikim. Helbet ne pereyên mezin, kêr zede, bi qasî ku ez bijîm.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Lazimî pir û gelek in. Ji kîjanê dest pê bikim? Hemû jî di vê astê de lazimiyên sereke ne bi min. Her parçeyê Kurdistanê jî xwedî şert û taybetmendiyên cûda ne. Wek mînak; li bakur perwerdehiya Kurdî tiştekî sereke ye ji bo şanogeran û ji bo namzetên şanogeriya Kurdî û tevî vê, pêdiviya me bi konservatuvaran jî heye. Lê zor dixuye ku demokrasî were Tirkiyeyê û ev tişt bi hêsanî pêk werin. Loma jî heta ku dewleteke serbixwe ya Kurdan ava nebe, lazimiyên sereke bi hêsanî çareser nabin. Lazimiya herî sereke Kurdistanek e.

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?

Bêdisiplînî, tiralî, bêbawerîtî, nexwendetî.

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?

Gelo temaşevan ji ast û hejmara me şanogeran razî ne?

5- Di şanogeriya de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Xeyalkirin tiştekî mîna azadiyê ye. Ez jî xeyalperestekî xwedî per im û hemû xeyalên min jî mezin in. Heta niha gelek xeyalên min pêk hatin. Hîn jî pêk tên. Dema xeyalên min ên nû pêk hatin jixwe ew dê eşkere bibin.





RÊZAN KAYA

Ji Amedê ye. Di sala 2002an de dest bi şanoyê kiriye. Rêzan Kaya, di 2009an de, li zanîngeha Atatürkê ji beşa Şanoyê mezûn bû. Ji wê rojê û vir ve, di Şanoya Bajêr a Amedê de kar dike.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Wexta mirov şanoya taybet bike debar hinekê zor dibe. Hewce ye mirov di ber re karên din jî bike. Ez jî wisa dikim.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Pirsgirêka herî mezin, nivîsandina tekstên şanoyê ye. Herî pir di aliyê tekstan de em zehmetiyê dikişînin.

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?

Ez dikarim bêjim ku tiştê ku min xisûsî aciz dike tune ye, tiştê herî xweş ew e ku mirov şanoyê bike.

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?

Gelê Kurd nû bi nû şanoya Kurdî nas dike, ji ber vê jî eleqayeke mezin heye; yanî ez ji temaşevanên xwe razî me, bila temaşevan jî ji me razî bibin.

5- Di şanogeriya de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Ev pirseke hinekê zor e. Tenê xeyaleke min hebû; min dixwest ez bibim lîstikvana tiyatroyê. Ew xeyal, niha pêk hatiye, hêvî dikim heta bi hetayê wisa berdewam bike.



TUNCAY ÖZEL

Di sala 1990î de li Hezoya Batmanê hatiye dinyayê. Di 2014an de li Batmanê tevlî koma Araf Şanoyê bû. Di 2018an de bi hevalên xwe re li Stenbolê Şa Performans avakir. Niha jî xebatên xwe yê şanoyê wek lîstikvan û derhêner didomîne.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Heta niha min ji şanoyê ti pere qezenc nekiriye. Dev ji debarê berde, em dibêjin em nexisirin û ji berîka xwe nedin, ew jî kar e.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Ji bo Şanoya cîhanê çi hewce bin, ji bo şanoya Kurdî re jî heman tişt hewce ne lê ji ber ku em bê dewlet in, di şanoyê de em du sê gav li paş in... Lê ji bo ji nav wan bêderfetiyan, em şert û mercên xwe bikin wek hev, divê em bêhtir bixebitin û çi ji destê me bê em zêdetir bikin

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?

Du pirs min pir aciz dikin: çima şanoya Kurdî? û "Bilêtên şanoya Kurdî çima buha ne?"

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?

Ew piçekê girêdayî me ye. Heke em berhemên baş çêbikin wê hejmar jî û ast jî zêde bibe.

5- Di şanogeriya de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Bi xebatên baş, Şanoya Kurdî li cîhanê bidim nasîn.





ZINAR ATAMAN

Di sala 1995an de li Bêşebaba Şirnexê ji dayik bû. Di sala 2013an de li Enqerê dest bi şanoyê kir. Di lîstika “Di Tuwaletê de” lîst. Niha jî karên xwe yên şanoyê didomîne.

1- Tu ji şanogeriya kurdî dikarî pere qezenc bikî an jî debara xwe bikî?

Bi rastî di vê demê de pir zehmet e ku meriv bi şanoyê debara xwe bike, ji ber vê; ez di ber re karên din jî dikim.

2- Li gorî te; lazimiya sereke ya tiyatroya Kurdî çi ye?

Divê em zêdetir lîstiken şanoyê çêbikin. Divê em Kurdan, bi şanoyê binin cem hev.

3- Dema tu karê xwe dikî, herî zêde çi te aciz dike?


Ger temaşevan ji lîstikê hez neke, ez aciz dibim. Wekî din, gava ku ez nikarim li şanoyê bilîzim, ez aciz dibim.

4- Tu ji ast û hejmara temaşevanên şanoya kurdî razî yî?

Na, divê hejmara temaşevanan zêde bibe. Lazim e gelê Kurd bêhtir aliyê me bike û were temaşeyê.

5- Di şanogeriya de xeyala te ya herî mezin çi ye?

Ez dixwazim ku rojekê dibistaneke şanoyê vekim û dixwazim birayên xwe yên biçûk perwerde bikim.





COUCHSURFING 101:

Seba Cimeata Gerokan



BIRAHÎMÊ MÎREKÎ
ibrahimmireki@gmail.com

Waxtê mirov bixwaze li cîhanê bigere, divê nêta ewilîn bibe nasîna mirov û çandan. Çanda xelqekî herî baş di nav malên wan de belî dibe: Bi min; tu çawa mazûvaniya yekî/ê dikî an jî çawa dibî mêvanê yekî/ê, ev tişt çanda te kifş dike. Derheqê mazûvan û mêvanan de, di sala 2003an de li Emerîkayê malperek bi navê Couchsurfing hatiye avakirin. Du beşên malperê hene, yek mazûvantî yek jî mêvantî. Yanî çawa? Eger gerok li welat û bajarên biyanî bigerin û bixwazin li wir bimînin, bi riya vê malperê dikarin ji xwe re cihê mayînê peyde bikin û li mala mirovên ehlê wî bajar an jî wî welatî bimînin. Mînak hûn ji Kurdistanê derketin û çûn Spanyayê bo ger û seyranê. Hûn ne mecbûr in biçin

otekê û waxtê xwe li wir bi tena serê xwe derbas bikin. Hûn dikarin bi riya CS'yê li ba niştecihên Madrîd û Barcelonayê bimînin. Ev tişt, him riya danûstandina çand, fikr û zimanan vedike him jî hûn bi alikariya ehlên wan bajarên, gera xwe rihettir dikin. Li aliyekî din, eger turîst an jî gerokek hati-be bajarê we, Amed an jî Mêrdîn û Wanê, hûn dikarin daxwazekê bişînin wê/wî seba mazûvaniyê. Gava daxwaz hat qebûl kirin, êdî mêvan mêvanê Xwedê û yê we ye.



(Wêne: ez û mazûvanê min ê Londonê, Uzi, cihuyekî Kurdistanî.)

ÇAWA DIKARÎ MAZÛVAN AN JÎ MÊVAN BIBÎNÎ?

Bersiva vê pirsê hinekî girêdayî cidiyeta bikarhêner e. Tiştê ewilîn ev e, divê hûn profîla xwe ya CS'yê rind û pak tijî bikin. Gerek profîl ji sedî sed tamam be da mirovê ku bixwîne bizanibe bê hûn kî ne û hûn d'ew û doza çî li wir dikin. Beriya ku hûn daxwazê bişînin yekî/ê, lazim e hûn profîla wê/wî bixwînin. Hinek bikarhêner seba ku bawer bikin ka we profîl xwendiyê an na, peyveke bişîfre dinivîsin li profîla xwe û waxtê we daxwazek şand, divê vê peyva veşartî jî pê re bişînin. Eger mirov profîlan nexwîne û direkt daxwazê bişîne, ev tişt li cem bikarhênerên din ne etîk e û ihtîmala qebûlkirina we kêmtir dibe. Ya duyemîn, wêne ye. Bila fotoyên we li ser profîla we hebe, ne yek ne didu ne jî sê, bila birrek bin. Çiqas zehf be, ewqas baş e. Wêneyên we yên bi hevalên we û "surfer"ên din re, tê maneya sosyalbûna we û ewlebûna profîla we. Ya sêyemîn, ji xwe re referansan bigrin. Wextê roja we bi yekî/ê re qediya, di dawiyê de herdu alî jî referans dinivîsin. Lê ji xeynî Mazûvan û Mêvanan, beşa referansa hevalan jî heye. Hûn dikarin ji hevalên xwe rica bikin, bila we li referansan binivîsin. Li CS'yê bextê xwedîreferansan tim vekirî ye. Lê dîqet

bikin! Referansên neyînî jî hene. Herçiqas mirovên li CS'yê yên hevdu dîtine û zewicîne hebin jî, ev der ne cihê tolazîyê ye û divê hûn pir baldar bin. Referans nayên jêbirin. Pêşniyaza min a dawî jî ev e; dema yek we li mala xwe hewand, û bû mazûvan, rêz û hurmet pir girîng e; Divê tu rêzê li yê hember bigrî. Dibe ku rêbaz û qedexeyên malê hebin, wekî cixare kişandin, an jî saeta ketin û derketina malê.

WEKÎ DIN ÇI HENE?

Li pîrriya bajarên dinyayê, civînen Couchsurfîngê tîdîdaristî. Her hefte an jî mehê du caran, mazûvanên wan bajaran, bi mêvanên xwe re tev li wan civînan dibin. Beşdar di civînan de çîrokên xwe yên CS'yê dibêjin. Otostopvanên rîya dirêj, xwediyê çîrokên pîr ecêb in mîsal, eger rîya we bikeve civînekê, teqez guhê xwe bidin wan. Hevdîtî li pîrriya deran bi zimanê Îngilîzî çêdibin da ku her kes hevdu fêhm bike. Eger li bajarê ku hûn dijîn, hevdtînen Couchsurfîngê tune bin hûn dikarin bibin yekem kes ji bo civîna lidarxistinê. Li ser malpera CS'yê hûn dikarin çalakîyên cûrbicûr biafirînin. Li wan civînan hûn ne tenê mirovan nas dikin, herwiha hûn bi zimanên din re jî têkildar dibin. Eger hûn bixwazin, hûn dikarin tenê ji bo pêşxistana zimanên biyanî jî tev li Couchsurfîngê bibin.



(Wêne: Komeke Couchsurferan, Kanadayî, Meksîkayî, Spenyolî û Kurd. Min sala 2018an, li Antalyayê mazûvaniya wan kir.)

MEYDAN E!

Nivîskar Û Xwîner Hevdu Rexne Dikin

Gelo nivîskar xwînerên Kurd çawa dibînin?

NIVÎSKAR



EVDILA KOÇER

Xwendevana/ê pir û pir hêja, Wê niha çend nivîskar û ne-nûserên kurd, hinek rexneyên ecêb li hiş û gurçik û kezeba te bigirin... Lê tu qet goh nede wan dilocan, li wan negire, wan efû bike... Ma ew kî ne heyran? Ma pirtûk û şekal û simbelên wan çend pere dikin?! Nivîskarên ku qedr û qîmeta te nizanibin, bila şerm û fihêt bikin, bila xwe di ser Birca Belek re bavêjin çemê Dicle û Botanê, bila teniya reş a gund û bajarê te, li pirtûk û rûyê xwe bidin... Te got erê dilê'm? Bila di navbera me de bimîne, lê tenê ez te xweş nas dikim... Tu xwendevanekî/e pir jîr û zana, spehî û delal, kubar û nazenîn, baqil û şareza, serketî û serfiraz, xwenas û dilovan, dilnizm û dilpola, kedkar û fêdekar, wêjenas û gotinnas, rexnebêj û xwerexnegir, welatparêz û zimanparêz û nivîskarparêz î! Têm destê te qurban...



RECEP DILDAR

Hinek xwendevan bêyî ku dest bavêjin qelemê, xwe nivîskarên herî baş dihesibînin; loma zêde guh nadin nivîskaran. Nivîskarê herî baş ew e ku li benda roja xwe ye.

Hinek xwendevan jî, ji xwendina ku dikin bêhtir, bejn û bala xwe derdixin pêş.



ÎRFAN AMÎDA

Xwîner tenê qala nivîskariya xurt dikin lê divê haya wan ji xwîneriya xurt jî hebe. Bêyî xwînerî û xwendina xurt wêjeya kurdî bi pêş nakeve. Gelek xwîner wêjeya kurdî wekî sûretekî tenê dibînin. Ev yek destûrê nade ku wêjeya kurdî û berhemên kurdî azad bibin.




ÎLHAMÎ SÎDAR

Xwendevanên Kurd bi rastî pir jîr in. Xwendevanên ji dil in. Gurê pirtûkan in. Baş û xirab ji hev derdixînin. Kêm in, ji ber ku xwendina kitêbên kurdî karekî zehmet e her kes nikare xwe bide ber. Ji bo xwendin û têgihîştinê bingeheke xurt divê. Minak şagirteke 12 salî jî bi hêsanî pirtûkên Tirkî yên Sait Faik Abasıyanîk bixwîne û têbigihêjê. Îca li xwendina “Balindeyên Ber Bê”ya Eta Nehayî û “Xewna Pirepindan” a Şêrzad Hesên bifikirin an jî “Em Li Vir in” a Beroj Akreyî... Ji vî alî ve asta xwendevanên Kurd, ji gelek rexnegirên me bilindtir e.

Lê qismek xwendevan jî hene ku ji xwe re dibêjin “xwendevan”, karê me nivîskaran bi wan re pir zor e; serê me bi wan re ketiye belayê. Keysa xwe li kijan kitêbê binin, wek zeviyeke bêxwedî dikevin navê û tarûmar dikin. Ji wan kirî edîtorî û redaktoriya kitêbê bi wan maye. Mebesta wan ew e ku henekê xwe bi nivîskêr bikin.

Mixabin rexnegirên Kurd jî bi vî awayî tevdigerin.



JAN DOST

Xwedê xwînerên kurd ji nivîskaran bisitirîne û hew.

XWÎNER

Gelo xwîner nivîskarên Kurd çawa dibînin?



WAHDET UÇAR

Dixwazim weke xwînerê, li ser xwîneran bikim rexneya xwe.

Em naxwînin. Bi rastî em naxwînin, kesa/ê salê 2-3 pirtûkan bixwîne jê wa ye go hemû nivîsarên li ser dinê xwendine. Vêca, wextê ku xwendina me kême fêmkirina me yî ji dinê jî kême dibe, em hewl nadin tiştekî li xwe zêde bikin lewra qey jixwe zanayên herî mezin ne em in?

Welhasil, divê em wiha nekin. Divê em bixwînin da ku bêjînga me ya ji bo nivîskar û nivîsarên me xurttir be. Bixwînin yabo bixwînin!



AZADÊ WEYSÎ

Hin nivîskar hene bêyî ku hînî zimên bibînin an jî bixwînin, dinivîsin ha dinivîsin. Ne gramer heye ne tevn, tu dibê qey şorbenîskê çê dîkin.



SERHED SERHEDÎ

Helbet wekî hemû nivîskarên cîhanê nivîskarên me jî dixwazin bînin xwendin û ecibandin. Lê mixabin ev pîrî caran nabe nesîbê tevan. Li ser gotinên nivîskarên me yê Kurd, wexta ku berhemên wan nayên ecibandin heçko ku problemeke me bi şexsê wan ra hebe dihesibînin, heyran dibe ku em ji berhema we hez nakin lê ji we hez dîkin, careke din biceribînin; dibe ku me hez ji ya vê carê kir.



HÜLYA KAZANCI

Ev ne dilxweşiya me, ji rûyê nivîskarên me ye. Em, ji edebiyatê heta sînemayê, ji îqtisadê heta siyasetê, di her disîplinê da gihiştine asteke mayî -ku hê zanyar jî nizanin nav lê bikin-. Rewşenbîren mîletê Kurd, bi qasî xwîneran mîletê Kurd serwext nîn in. Ji bîr nekin ku xwîneran mîna me nabin nesîbê her mîletî; loma jî jkx. hinekî zorê bidin xwe, layiqî me bin. Spas.



İREM BASUT

Nivîskar ew e ku ne di nav bûyeran de be. Li gorî min divê xwe nekin qurban çanda populer. Divê ji dûr ve nêzî bûyeran bibin û bi perspektîvek objektîf binivîsin. Herwiha analîzên xweşik bikin. Heke warê wan ne mîzah be, divê xwe ji mîzahê dûr bigrin.

LÎKORA KURMANCÎ



GÜLESRA GÜLLÜ
guleasteroidb612@gmail.com

Bi Lîkorî...

Tê bîra min; gava ez hîn zarok bûm, ji bo bapîra min xweşaveke taybet çêdikin. Hinek tirî, zedele(mişmiş) û hingivîn dixistin nav avê. Paşê jî ew av hefteyekê li ber tavê dihiştin. Her roj camêr an jî canikek jî bi xêra xwe ew av li nav hev dixist. Piştî hefteyek derbas dibû ew xweşav dibirin ber kaniya sar. Li vir jî dihat sarkirin û paşê hazir bû ji bo bapîrê min wê daqurtîne û vexwe. Ji tirsan ti kes nikaribû wê xweşavê vexwe tabî.

Dapîra min jî şibhê bapîrê min, tiştên taybet ji xwe re çêdikin. Mîsal diçû Pîranê Artos û li wir çî giya hebin berhev dikirin. (Pîranê Artos, navê Ziyaretekê ye li çiyayê Artos) Pişt re li gel fêkî û biharatan ew dikelandin. 3-4 rojan li ber tavê ew dihiştin, paşê jî dema payîz dihat bi zorê didan me.

Digot: “Ji bo nexweşiyên, nexasim ji bo gewriyan pir baş e, vexwe keça min!” Li gor min; him dapîr him jî bapîrê min, tehma devê xwe dizanibûn. Min jî car caran wekî kalê xwe xweşav çêdikir. Dema zivistan dihat, ligel Vodkayê min ew noş dikir.

Herduyan jî terifên zehf xweş ji min re helan lê mixabin heta rojnamegarekî Frensî ji min re negotibû “Ewa tu vedixwî lîkoreke pir xweş e. Gelo tu dikarî terifa wê bidî min?” Min ti car nedizanî ku ew terifên hêja yên lîkorê ne. Ez bawer im dapîr û bapîrê min jî nedizanîn. Jixwe heke mêjera alkolê di bin %20î de be, ew wek lîkor nayê hesabandin. Kalê min jî di bin %20î de maye. Mixabin...

Îcar min da pey rîya lîkorê...Ji sala 2013an heta 2016ê, min şerab çêdikir. Piştî gotina wî rojnamegerî, min ji xwe re biryarek da û got “Ez ê êdî lîkoran çêbikim.” Terifa kalê min, ji min re bû rê û rêberek. Ewilî ez bi fêkiyan re mijûl bûm. Gundor, fişne, gêlaz, hinar, pirteqal...

Min bi van mêweyan tehmeke baş afirand. Paşê jî çiqas biharat û giya hebin, ligel wan min ceriband. Sal derbas bûn; ha min dît ku ez êdî lîkoran çêdikim û bi pey tehmên nû dikevim. Ev yek, ji min re bû zewq û kelecaneke balkêş.

Gelo ev lîkor çî ye? Ji ku derketiye? Vexwarina wê çawa ye? Em jî dikarin lîkorê çêbikin? Terifa wê çawa ye?

Çîroka me hêj neçûye deştê xwendevanên eziz!

Me nû dest pê kir. Ez ê ji bo we gişan qala çîroka lîkorê bikim.

Lîkor; bi latinî ‘Liquor’ tê nivîsandin ku maneya wê jî şileyîkirin e Fêkî, biharat an jî riwek, bi şekir re tîn şilkirin û ew dibuhirin alkolê. Hin caran li ber tavê, carinan jî li ber tariyê tê sekinandin. Paşê jî tê vexwarin. Herçiqas li Tirkîyê, li ber qehwê bê îkramkirin jî, lîkor her dem, her gav û li ber her tiştî tê vexwarin. Yanî hûn dikarin meşrûbata xwe, li gel lîkorê bikin kokteyl û vexwin.

Dîroka lîkorê heta bi dewra şoreşa cotkariyê ve diçe. Lîkor ewilî li nav manastiran (xilwet) belav bûye. Ji ber ku di nav de giya û nebatên cûrbicûr hene, wê demê ji bo şifayê dihat vexwarin. Heke em li teknîka lîkorê ya îroyîn mêze bikin, em dikarin bêjin ku ew cara yekem li Îtalyayê hatiye hilberîn.

Rast e an çîrok e nîzanim lê dibêjin lîkor bi saya Îtalyayîyan li Ewropayê belav bûye.

Çîrok ew e ku bi navê “Medici” li Ît-alyayê malbateke bi nav û deng hebûye. Bazirganî û gelek tiştên din, hemû di destê wan de bûye. Camêran li ser lîkorê jî bûne hosta. Lê ti car terîfa lîkorê nedane kesî. Piştî ku keçika Mediciyan Catherine, ligel Qralê Fransayê (II. Henri) dizewice, ew sirra terîfê jî hêdî hêdî belav dibe. Catherine dixwaze gelê Fransayê bextewar bike. Ew dixwaze ji bo nexweşiyên bibere derman, ji ber ku ew êdî bûye stiya Fransayê. Bi saya vê xanimê, terîfa lîkorê berbelav dibe. Hê jî li dinyayê lîkorên herî navdar ên Fransa û Îtalyayê ne.

Mînak; lîkorên bi navên ‘Chartreuse’ û ‘Grand Marnier’ gelek bi nav û deng in. Ew-îlî Keşîşan ‘Chartreuse’, ji 130 çeşîd riwek û koka riwekan çêkirine. Li cîhanê yek ji tehmeke taybet û lîkoreke xweş tê hesabandin. Çimkî biharatên tehl, bi xêra wê lîkorê hatin zanin. Ji salên 1600an heta niha, hê jî îmal dikin. ‘Grand Marnier’ jî lîkoreke meşhûr e. Ev lîkor jî pêşî, di salên 1880an de li Parîsê hatiye çêkirin. Di nav de Konyaxa Frensî û tûkilê pirteqalan hene.

Lîkoreke din a bi navê wî Jagermeister jî zehf tete nasin. Wê jî ji salên 1930an heta niha li cîhanê deng vedaye. Dibêjin nêçîrvanan ev lîkor hilberandiye. Di nav de 80 celeb riwek hene. Ew riwek, him rihê mirov him jî laşê mirov germ dikin. Loma jî Jagermeisterê di hewayaya sar de vedixwin.

Kurdan jî li ser lîkorê hin tişt kirine. Lîkor ji ser sifra Kurdên Xristiyan û Cihûkêm nebûye. Herî zêde Kurdên Yahudî jî lîkorê hez kirine. Wan tiriye hişk(mew-ij), mişmişên hişk(eşbabî) û hêjîr tev li ava şîregermî kirine û xweşav çêkirine. Herçiqaş lîkora wan jî mîna ya bapîrê min bêalkol jî be, ez wê, wek terîfa lîkorê qebûl dikim. Ji ber ku car caran alkol jî dixistine navê. Kurdên din jî (Bawer dikim ew em in) heke cîranekî wan ê Ermen an jî Suryan hebûya, lîkorên xweş vexwarine an jî ji xwe re çêkirine.

Ev 4 sal in ez lîkoran çêdikim. Di sersalan de jî, ji bo hevalên xwe diyarî dikim.

Xeyala min ew e ku siberojê li ber behrê bijîm û lîkorên taybet îkramî mêvanên xwe bikim. Em li ber sohbeta dostan vexwin û li ser tehman xeber bidin. Ez nizanim ev xeyala min dê pêk were an na lê ez ê li dû herim.

Ji bo xwînerên ezîz ên PopKurdê terîfê-ke lîkorê jî bêjim.

Belkî îsal hûn jî diyariyek ji min re bikin.

LÎKORA QERSÛ (FÎŞNE)

Hewcehî:

- 1 kg. Qersû
- 2 îskanên mezin şekir
- 3 dar darçîn
- 10 lib qernefil
- 2 kevçiyên biçûk mistek(damla sakızı)
- 35 cl. Vodka
- Ji bo demkirinê, şûşeyeke krîstal (5 kg)

Ewîlî qersûyê xwe bişon û bistkên wan jêbikin. Qersûyên xwe bixin nav şûşeya Krîstal û bi ser de jî 2 îskan şekir vala bikin. Devê şûşeya xwe qewî bigrin û şûşeya xwe deynin ber tavê. 20 rojan li ber tavê bisekinînin lê rojê carekê şûşeya xwe bihejînin.

Piştî 20 rojan darçîn, qernefil û mistekê têxin nav cilkekê. 20 rojên din, wekî cara ewil, li ber tavê bihêlin û dîsa rojê carekê şûşeya xwe bihejînin. Piştî 40 roj di ser re derbas bûn, şûşeya xwe bipalînin/vala bikin. Libên qersûyan deynin kavanozekê, bila tê de bimîne. (Zivistanê li ber kokteylan gelek xweş dibe.) Ava qersûyan jî deynin dolabê. Hûn dikarin wisa jî vexwin lê ez hinek vodka jî dixim ser. Hûn bi qiyma xwe ne êdî. Mehekê, li cihekî tarî û hênîk mihafeze bikin.

Piştê mehekê lîkora me hazir e bo vexwarinê.

Noşî canê we be!

POP PIRS

• Murat Özyaşar

Murat Özyaşar, di sala 1979an de li Diyarbekirê hat dinyayê. Bi kitêbên xwe yên "Ayna Çarpması", "Sarı Kahkaha" û "Aslı Gibidir" gelek xelatên edebî girtin. "Ayna Çarpması", "Sarı Kahkaha" ji bo Kurdî jî hatin wergerandin.

Peyva ku tu herî zêde jê hez dikî?

Hewes.

Tu dikarî kêliya xwe ya herî bextewar ji me re bêjî?

Dema keça min Mavi Lorîn di xewê de ye, birihên wê wisa diçin jor û tên jêr, ji nişka ve dibişire, dema ew xewnekê dibîne, ez hîs dikim ku xewn jî wê dibine. A ew kêlî..

Tehemula te ji çi re tune ye?

Ji tiştê ku bêyî fikirîn, tên kirin.

Te li vê dinyayê herî pir dixwest kê nas bikî?

Bilge Karasu.

Xeyala te ya herî mezin çi ye?

Nivîsandina wê hevoka ku ez dibêim qey ez ê tu carî nikaribim binivîsim. Belkî jî ew hevok tene ji 3-4 peyvan pêk tê.

Bi xêra xwe hevokeke ji strana ku herî zêde jê hez dikî bibêje.

“Dinya pencereyek e, yê ku tê, lê dinêre û diçe.”

Çi kenê te tîne?

Hin hevalên min û ew tiştên ku tînin bîra min ez bêfesa(şakar) im.

Dengê ku tu herî zêde jê hez dikî?

Dengê qelemê, gava ku li ser xêzên defterê digere û bêdengiya di navbera peyvan de.

Heke cardin bihatayî dinyayê, te yê çi tiştî cardin bikira?

Ew tiştên ku divê min nekira, min ê car din bikira.

Tiştê ku îlamê dide te çi ye?

Acizî.

Dîmeneke çawa te aciz dike?

Ew dîmena ku tê de hîç merhamet û wijdan tune ye.

Te dixwest tu li ku derê bijî?

Li cihekî ku erd û ezman digihîje hevdu.

Qisûra te ya herî mezin çi ye?

Pirr zû bawer dikim.

Tu dixwazî çawa bimî?

Piştî ku min got “Erê! Ez jiyam”

Dixwazî çi li ser gora te bê nivîsandin?

Wey qurban! Xilas bû ew acizî.



GELO KURDBÛN GOŞT E KU HINEK KURD NAXWAZIN BIXWIN?



Şêx Zelala ji Finê

Mixabin dema ez rastî hinek kurdan têm û dema ji wan tiştên ‘sosret’ û ‘dûrî aqil’ dibhîsim yekcar ev yek tê bîra min û dibêjim qey Kurdbûn goşt e û hinek ji me jî goşt naxwin(vejeteryan in) lewma xwe ji Kurdbûnê ewqas dûr dixin.

Hinek kurd sedem dîn xwe ji Kurdbûnê sar dikin û hinek jî sedem bê dînîya xwe, hinek sedem fikr û ramanên xwe yên şexsî xwe ji Kurdbûnê dûr dikin û hinek jî sedem berjewendiyên xwe yên rojane...

Dema ev her du alî jî têne ba hev, her du alî jî hev sucdar û pîs dikin.

Min ji hinek kurdên dîndar bihîstîye ku gotine, heke bi kurdî dersên dînî nedin em ê kurdî hînî zarokên xwe nekin lê min ji kurdên ne dîndar û yên Xwedênenas jî heman tiştî bihîstîye. Ewan jî gotine, heke dersên dînî bi kurdî bidin em ê zarokên xwe hînî kurdî nekin û em ê wan ji kurdî dûr bikin.

Hem jî yên van tiştan gotin û yên xwediyê van fikran li ser zimanê kurdî dixebitin û ku tu ji wan bipirsî jixwe wê

bêjin, prensîba me xizmeta zimanê kurdî ye. Rast e, ev kes li ser zimanê kurdî hin xebatan jî dimeşînin. Yanê ne mirovên nezan in û ne ji rêzê ne jî. Tev mirovên xwenda, entelektuel û bijarde ne.

Dibêjim heke bijardeyên me wisa bin ka Xwedê dizane kurdên din vêga çi dikin û çi nakin. Ev yek jî min ditirsîne.

Piştî rastî van her du cure fikr û ramanên qirêj êdî hûn dikarin piştevaniya wan bikin? Ez bi xwe nikarim piştevaniya her du alîyan jî bikim. Ji ber ku her du alî jî ji hev mejî qirêjtir in.

Çima?

Ji ber ku Kurdbûn ne dîn e ku yek dîndar be û xwe nêz bike û yek bê dîn be û xwe jê dûr bike. Ez rast nehatime ku tirkekî yan erebekî yan farisekî wisa gotibe. Ez bawer nakim ku di dilê xwe de jî gotibin yan carekê bi şaşî anîbin bîra xwe jî. Jixwe tu behsa vê sosretê li derekê, li ba mirovên biyanî bikî biborin lê wê we bikin tilîpindik û wê liser we bikenin. Dê we bikin mijara tezên derûnînasiyê.

Gelek hevalên min yên biyanî hene û min ji yekî jî tiştêkî wisa sosret nebihîstîye. Heta çend heban ji wan ji aliyê dewleta xwe ve zêde êş jî dîtin, ji kar hatin qewirandin, îşkence dîtin, di zindana dewleta xwe de man, sedem dewleta xwe bê pere man û ji ber van rewşan jî derûniya wan xira bû, xwestin xwe bikujin û ji devê topê filitîn lê yek carekî negotin dewleta me wisa li me kiriye lewma em ê bi zimanê xwe neaxivin,

em ê zimanê xwe hînî zarokên xwe nekin, em ji çanda xwe û ji zimanê xwe nefret dikin.

Çi kirin?

Bêhtir xwe bi zimanê xwe ve û bi çanda xwe ve girêdan. Tu diçî mala wan dibînî ku ala wan daliqandî ye û odeyekê sirf ji bo sembolên neteweya xwe veqetandine. Di malên xwe de bi zarokên xwe re bi zimanê xwe diaxivin û bi zimanê xwe dijîn û tenê wan rayedarên ku wisa anîne serê wan suçdar dikin.

Ya rastî ev tê bîra min. Heke ew kurdên ku min li jor behsa wan kir ji dewleta xwe ewqas îşkence bidîtana nexwe wê bombeyan bi xwe ve girê bidana û xwe di nav kurdan de biteqandana.

Min di serî de jî got ku tiştêkî sosret e mirovek sedem mirovekî yan sedem dîn yan sedem bê dîniyê, xwe ji zimanê xwe û ji çanda xwe dûr bike û xwe û zarokên xwe ji zimanê xwe kêmbihêle.

Ev yek li dijî xwezaya mirovahîyê ye, li dijî tebîetê ye.

“Bi min” li ser genê yên wisa hatiye leyistîn û lewma ji xwezaya mirovahîyê jî dûr ketine. Heke ne wisa bûya wê bizanibûna ku dîn yan bê dîni fikr û raman in ango kinc in lê belê nijad û ziman laş in ango hebûna mirovan in.

Tu kîngê bixwazî dikarî kincên xwe biguherî û heta bixwazî dikarî bavêjî jî lê belê tu çî jî bikî nikarî laşê xwe bavêjî.

Dengê hinekan dibihîsim ku dibêjin, tib gelekî pêş ketiye lewma êdî pêkan e wisa bikin.

Nexêr! Heke bi operasyonên tibî li ser laşê xwe bilezî jî wê dawiya te qet ne baş be û ihtimaleke mezin tu yê bimirî. De herin çermê laşê xwe biguherin û çermekî din li laşê xwe zêde bikin? Hûn dikarin wisa bikin?

Nijad û ziman jî bi heman awayî ne. Her wisa ye jî nexwe çima em li gorî rastiyên

xwe û rastiyên dinyayê tevnagerin û diçin tiştên ecêb û sosret dikin?

Li ser van ecêban jî ez dixwazim çend tiştan bibêjim ku serê we li ser vê mijarê zelaltir bikim. Ez ê behsa bûyera herî dawî ku hate serê min bikim ku hûn fêmbikin min çima van tiştan bi we re parve kir.

Van rojan min çend hevalan nas kir. Tev jî kurd in û tev jî mirovên pir hêja ne. Xwenda ne, zana ne, xwe pêş xistine û dinyadîtî ne. Tenê kêmasiya wan ew e ku ji kurdan dûr mezin bûne û derfet nedîtine hînî zimanê xwe bibin. Ku guhdariya çîroka wan bikin hûn ê jî fêmbikin sucê wan tune. Ew piştî vî emrî -hinek ji wan 40-50 salî ne- hewl didin ku xwe hînî zimanê xwe bikin û naxwazin êdî bê ziman bin. Ji bo vê yekê jî çî ji wan tê dikin. Diçin qursê, ders dixebitin, dixwazin ji xwe re der û doreke kurd û kurdjîn bibînin. Gelekî li ber xwe didin.

Lewma suçdar ne ew in lê belê dibe ku suçdar mezinên wan bin lê ew jî nîvî. Welhasil, jixwe mijara me jî ne ev e.

Hevaleke kurd û ku nû ketiye nava kurdan hat û ji min re got, Zelal tu di nava kurdan de yî û dibe ku haya te çêtir ji sazî û dezgehên kurdî hebe û got, hinek hevalan ji min re gotine neçe weqfa Îsmail Beşikçi. Jê re gotine ew zîrar didin kurdan û yên tê de dixebitin jî îxanetê ji kurdan re kirine û dikin jî.

Hevalê jî ji min pirs kir û got bi te ez çî bikim? Ez herim wir yan na?

Li ser pirsê wê hevalê ez zêde matmayî nemam. Ji ber ku ez rastî ewqas tiştên tewş hatime ku êdî ji tu tiştî matmayî namînim. Êdî kî çî dibêje ez dibêjim ev jî asayî ye. Hem berî çend salan ji min re jî gotibûn neçe enstitûya kurdî û gotibûn mamoste û xebatkarên wê derê tev xaîn in.

Mereq dikim ka çawa dikarin ewqas tund û ewqas bê minet li hemberî hev diaxivin jî. Bêje hez nakim, bêje li dijî fikrên min in, bêje li dijî jiyana min in icar xaîn çî ye? Çima peyveke ewqas tund?

Min bersiva wê hevalê da û heman bersivê dixwazim li vir jî bidim ku hûn jî bizanibin û guh nedin mirovên tewş û tenê li ser zimanê xwe û li ser çanda xwe bixebitin. Xebat ji we neyê jî qet nebe bifikirin.

Hevalino, ji we rica dikim dema tiştê kêrî çanda we û kêrî zimanê we were û ku hûn jê hez nekin neçin û sedem fikrên xwe yê şexsî wan xebatan reş nekin.

Dema ez nû çûbûm enstitûya kurdî ji min re jî gotibûn neçe û ji bo neçim jî li ber xwe dabûn lê min guh nedabû wan. Cihê sîyasetê, cihê fikr û ramanan û cihê kesayetê cuda ye û cihê xizmeta ziman û çandê cuda ye. Ez li ser sazî û dezgehên sîyasî naaxivim, li ser kesayeta mirovan jî naaxivim û parastina kesî jî nakim lê belê kesî jî sedem fikr û ramanên wan qirêj nakim, yan sedem fikr û ramanên wan keda wan reş nakim.

Heke hûn ji sazîyekê hez bikin herin û hez nekin jî neçin lê belê heke sazî yê kurdan bin wan li gorî aqilê xwe qirêj jî nekin û berê kurdan ji wan negirin. Bi taybetî jî berê kurdên nû kurdan nas dikin û yê nû digihîjin zimanê xwe...

Jixwe sazî û dezgehên ne sîyasî bin û li ser ziman yan li ser çandê bixebitin jî hûn neçar in ku reklama wan bikin. Hûn kurd bin neçar in wan û xebatan bi kurdan bidin naskirin.

Tevan?

Erê, tevan. Hem jî bê gotin û bê teksîr!

Divê em sedem fikr û ramanên xwe yê sîyasî yan jî şexsî yan jî dînî cudatî nexin navbera sazî û dezgehên xizmetkarên ziman û yê çandî.

Her xebatên ku kurd dikin kêrî kurdan tî. Dibe ku xebatek kerî min (te, wê, wî, wan, me) neyê lê yeke din bê. Lewma divê em tevan bidin nasîn.

Dibe ku hinek mirov ji ber hinek fikrên xwe nexwazin xwe nêzî her saziyê bikin lê ku em tevan bidin naskirin jî wê teqez yek ji

wan bala wan bikşîne û wê ji bo Kurdbûnê kêrî tiştêkî were.

Mînak, ez naçim nav çalakiyên tê de behsa araqê jî tê kirin lê ev hevala ku ez behsê dikim saya serê çalakiyêke wisa li ser zimanê xwe şiyar bûye. Kêrî yê wekî min nayê lê kêrî yê wekî wê hevala min tê û jixwe hatiye jî. Keçik saya serê wê çalakiyê û saya serê xebatkar û beşdarvanên wê çalakiyê niha vedigere zimanê xwe û hewl dide li her derê bi kurdî bijî.

Êêêê ku ez van tiştan dizanim û dîsa herim ji hevalan re bêjim, neçin çalakiyên wan, ew wisa dikin û wisa dijîn ne heyf e?

Heyf e!

Guneh e!

Îxaneta li hemberî zimanê kurdî ye!

Ji ber vê yekê jî fikr û ramanên xebatkarên hemî saziyên me me eleqedar nakin. Kesayeta wan jî me eleqedar nake.

Pa em ê neçin û bi wan re nezewicin ku em wisa bikin.

Bila xelet neyê fêmkirin. Ez tevgerên mirovên ne qenc naporêzim. Dizanim ku di her saziyê de mirovên ne qenc, yê ne dilsoz, yê bê kesayet hene lê belê ew nayê wê wateyê ku ew sazî wisa ye.

Di nava her rêxistinê de mirovên ku em ji wan hez dikin wê hebin û yê em hez nakin jî wê hebin.

Kurd ne 5-6 kes in ku tev wekî hev bin. Tev ne leşker û şoreşvan in jî ku tev di yek qalibê de bin. Em gel in û hejmara me jî tenê ji bo bakûr nêzî 20-30 milyon kesî heye. Lewma asayî ye em ji hinekan hez nekin û fikrên me û yê hinekan ji hev dûr bin. Bes divê em bi giştî li kar û xebatên wan saziyan binêrin. Heke ji me bê em ê wan kêmasiyên di wir de kêmasî bikin û wan pêş bixin. Heke neyê jî em ê ji bo pêşketina wan hewl bidin û wan bi kurdan bidin naskirin.

Îro weqfa Îsmail Beşikçi jî û Enstitûya Kurdî jî û Çalak Ewents jî ji bo çand û ji bo



ziman gelekî li ber xwe didin. (Bê guman sazî û komên me yên din jî hene lê belê ji ber ku mijar li ser van her sê saziyan/ci-vakan vebû min tenê navê wan da.)

Îro hinek hevalên dilsoz bi serê xwe jî li ber xwe didin. Divê her yek ji me li gorî fikr û ramanên xwe ji bo yên wekî xwe li ber xwe bide. Divê her yek ji me hewl bide ku kurdên ji aliyê fikr ve yên nêzî xwe hişyar bike.

Kurdên dîndar bila kurdên dîndar hişyar bikin û yên ne dîndar jî bila yên ne dîndar hişyar bikin. Bila kurdên neteweperwer û zimanhez jî tevahiya kurdan, lê belê di nava rêzekê de û bê perçiqandin û bê heqaret hişyar bikin.

Divê her yek ji me sazî û dezgehên kurdî bi mirovên li der û dora xwe bide nasîn.

Divê fikr û ramanên me yên sîyasî, şexsî yan jî dînî tu caran nekevin navbera me û zimanê me û çanda me.

Em ji tiştêkî yan ji kesekî hez nekin jî ku ji bo ziman û ji bo çanda me baş û bikêr be em neçar in ji bo bigihîje kurdan mil bidinê û pêş bixin. Lazim e em berî her tiştî bibin

kurd û tenê xêra zimanê xwe û çanda xwe bixwazin.

Ma qey çend sazîyên me hene ku em herin hinekan reş bikin? Ma qey hezar sazî û dezgehên me yên ji bo ziman û ji bo çandê û ji bo mejî hene ku em sê çar heban ji bo berjewendiyên xwe yên şexsî yan jî sîyasî yan jî dînî fida bikin jî wê zirar negihîje zimanê me?

Hevalino, dibe ku sedem wê tevgera we ya 'şexsî' kurdek derfeta Kurdbûnê nebîne! Wisa nekin û nekevin ber gunehên kesî.

Îro ev sazî û dezgehên hanê tev yên me ne û tev jî ji bo me dixebitin û em nikarin ji mirovan re bêjin neçin û ji wan feyde nebînin.

Xebatkarên tevan jî kurdên dilsoz in û her yek li gorî derfeta xwe hewl dide ku tiştêkî bike.

Divê em bêjin herin û ji wan feyde bibînin. Her yek wê li gorî xwe kêrî tiştêkî bê. Her yek wê li gorî şeweya xebata xwe û şeweya xwe kêrî kurdekî bê.

Silav û hezkirin.

Kek Nûdem Hezex,
gelo tu çima ti tiştî
naecibînî?

Bûtona laykê ya
jiyana min xira
bûye...

DELILLO&DENİZ

KOMÎSYONA KURDÎ YA BOĞAZIÇİYÊ

SILAV! NIHA EM Ê XWE BIDIN NASÎN





Merheba xwînerên vê e-kovara rengîn,
xwînerên POPKURD'ê.

Bi izna we, em wekî Komîsyona Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Boğaziçiyê, dixwazin piçekê qala xwe bikin. Komîsyona me, ji bo nasîna ziman û Edebiyata Kurdî û nasîna nivîskarên ku di vî warî de berhem dane, ji 2003an vir ve xebatan dike. Herwiha di vî warî de em lêkolînan pêk tînin û pêşkeşî xwendevanên xwe dikin.

Her sal berî ku heyama perwerdeyê dest pê bike, em dest bi xebatên xwe

dikin, bi endamên rêveberiya komîsyonê re, em plana serdema nû saz dikin, peywir û karan di nav rêveberiyê de belav dikin. Koma Xwendinên Kurdî, Koma Xwendinên Tirkî, Kurdish Speaking Club, Dersên Kirdkî (berê Kurmancî) komîsyonên me yên sereke ne. Paşê di civînên rêveberiyê yên di serê her heyamê de, xebatên wê serdemê bi beşdariya xwendekarên Zanîngeha Boğaziçiyê û hevalên ji zanîngehên din, em bi nîqaşan diyar dikin. Piştî diyarkirinê, bernameya xebatê tê amedekirin û li gorî vê bernameyê, xebatên meşandin. Di pêvajoya xebatên kurdî de, pirtûkên ji Edebiyata Kurdî tînin nasîn, nasandin, xwendin û nirxandin. Ligel nivîsên ji Edebiyata Kurdî, nivîsên Kurdî yên psîkolojîk, sosyolojîk, zanîstên fizîkî û dîrokî jî tînin nasîn û nirxandin. Bi koma xwendinên kurdî, em dixwazin di her aliyê jiyane de, cihê zimanê Kurdî berfirehtir bibe û derfetek bo avakirina fikirandina kurdî pêk were.

Di koma xwendinên me yên Tirkî de, bi hevalên beşdar re em li ser Dîroka Edebiyata Kurdî şêwr û mişêwrên datînin

**BILA HINDIK BE
BILA RINDIK BE!**

**KURDISH
SPEAKING
CLUB**

EVERY TUESDAY
HER SALI
HER SÊŞEM **BARAKA 17.30**

KOMİSYONA EDEBİYATA KURDÎ
KÜRT EDEBİYATI KOMİSYONU
KURDISH LITERATURE CLUB

Kurdish Literature Club

**Zazaca
Kursu
Başlıyor!**

18.00

Every Friday
Her İn
Her Cuma

**UNESCO: "ZAZACA KAYBOLMAK
ÜZERE OLAN 18 DİLDEN BİRİ"**

Boğaziçi Üniversitesi
Kuzey Kampüsü



Koma me ya axaftinê ya kurdî, wekî Kurdish Speaking Club jî, ji bo hevalên nikarin Kurdî baş biaxivin tê sazkirin. Di wan civînan de, heval bi Kurdî dipeyivin, bi lîstik, stran û çîrokan Kurdiya xwe pêş dixin. Da êdî kes nebêje “Em Kurdî fêm dikin lê em nikarin biaxivin.”

Mîsyona koma me, zêdekirina axaftina Kurdî û zêdekirina xebatên li ser zimanê Kurdî ye. Bo vê; çend heyaman me li Zanîngeha Boğazîçiyê di bin însiyatîfa Bued Kurdî de, dersên Kurmancî dan. Ji heyama 2019-2020 şûn de, dersên Kurdiya Kurmancî, li Zanîngeha Boğazîçiyê, di bin departmanta Civaknasiyê de, bi fermî tên dayîn. Me ji vê serdemê pê de dest bi kursa dersên Kirdkî kiriye. Mamosteyên me ji Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê tên û beşdarên me, li zanîngehê hînî Kirdkî (Zazakî) dibin. Ders ne tenê ji bo xwendekarên Boğazîçiyê û Kurdan e; xwendekarên zanîngehên din û hevalên ne-Kurd re jî dikarin tevî bibin.

Ji bilî civîn û dersan, em di Koma Edebiyata Kurdî de, karên kovargeriyê jî dikin. Kovara me ya bi navê “Zingil” berdewama

kovara “Wêjesterk/Yazınca” ye ku endamên berê yên koma me ew derdixistin. Kovara me ji nivîsên hevalên me yên di komîsyonê de pêk tên.

Mijarên kovara me ya îsal, Realîzma Efsûnî, Dîroka Şanoya Kurdî, Folklor û Jin in. Wekî din çend çîrok, werger, helbest û hevpeyvîn jî di kovara me de cî digirin. Tê de hin nivîsên ku kesên derveyî komîsyonê nivîsîne jî hene. Kovara me bi sê zaravayên Kurdî, bi Kurmancî, Kirmanckî û Soranî ye. Helbet em dixwazin yên nivîsan ji kovarê re dişînin bi Kurdî binivîsin lê herwiha yên ku Kurdiya wan gelek pêşketî nîn in jî hene. Em komîsyonekê ji bo wergera kurdî jî






ava dîkin û heke nivîsên bi zimanên biyanî hebin an jî nivîs kêm û xelet bin, em wan tercume an jî sererast dîkin.

Ma qediya, helbet na!

Wekî din Komîsyona me li ser çand û Edebiyata Kurdî çalakîyan saz dike. Em her meha Gulanê, li Zanîngeha Boğaziçiyê Cejna Zimanê Kurdî pîroz dîkin. Wekî din em panelan, guftûgoyan organîze dîkin. Ji bo rojên taybet ên wekî “Roja Zimanê Dayikê” û “Salvegera Helebçeyê” fîlman nîşan didin Her wiha em li ser Sînemaya Kurdî û Tiyatroya Kurdî atolyeyan, guftûgoyan û şanoyan li dar dixin. Di çalakîyên xwe de em hewl didin ku zimanê me hem kurmançî hem jî kîrmanckî be û wekî me li jor gotî; ji bo ku kesên her du zaravayên li Bakûr tîn xebirdan fam dîkin zêde bibin, em dersan, komên axaftin û xwendinê vedîkin.

Armanceke komîsyonê jî ev e ku xwendekarên bi ziman û edebiyata kurdî re eleqedar in bîne cem hev û di nav wan de pêwendîyan deyne. Hêviya me ew e ku di nav cîhana ku roj bi roj diguherê de, zimanê Kurdî zindî û serbixwe bijî. Em ji bo vê dişuxilin.



KA JI ME RE BIBÊJE

Di vê heyatê de,
te ji çi re got ‘xwezî’?



FEXRIYA ADSAY

Xwezî mirov bikaribûya ji tecrubeyên beriya xwe bêtir îstîfade bikira û ewqas dereng li xwe hay nebûya



AYDIN DERE

Xwezî ji yekîtîya gelê me yê çar perçeyan, me dewletek hebûya.



ABDULLAH İNCEKAN

Xwezî li Wanê li ber peravê Axtamarê pêleke behrê yan jî Helebçeyê çiqileke dara hinarê bama, ne mirovekî li xerîbîstanê... Xwezî pepûkeke bama li welatê rojê, ne mirovekî li bîyanîstanê... Yan jî xwezî mirin hebûya, kalbûn nebûya û porên min yên xelxelekî kêr û spî nebana... Xwezî ez ji wê dûr nebama û ramûsanek neba xwezîyek... Belê, ramûsanek neba xwezîyek... Xwezî...



ÜLKÜ BİNGÖL

Min di vê jiyandê de pala xwe daye mekan û zemanê ji me hatine dizîn go û dibêjim “ Xwezî dîrok li hemberî neteweya Kurd hinekî din dilovan ba.

ROPORTAJ

TARA MAMEDOVA

**“DI ZAROKATIYA XWE DE,
EZ LI OTOBUSA NAV BAJÊR
SIWAR DIBÛM, DENGÊ DEFÊ
JI KÛ BIHATA EZ DIÇÛM WIR.”**



GERNAS NENAS

Muzîsyena zîrek û dengxweş Tara Mamedova bû mêvanê Popkurd'ê. Gernas Nenas, pirsên ku we meraq dikirin, ji Mamedovayê pirsî...



Ji xeynî Kurdî, tu qet fikirî bi zimanekî din muzîkê bikî?

Nexêr, ji ber ku ez Kurd im. Di hest, hewl û jiyana min de koda herî sereke ye Kurdî. Ez bi vî zimanî jiyana xwe dimeşînin, ev ziman di kok û rehên min de geriyaye. Loma jî helbet hunera min jî dê bi Kurdî be.

Muzîk, di jiyana de teqabulî çî dike?

Tiştên ku min li ser piyan dihêlin, keça min Elenya û stran in. Her du jî zarokên min in. Bi rastî ez ne dikarim bêyî keça xwe, ne jî bêyî stranên bijîm. Di rojên herî zehmet de, gava Elenya nexweş bû, min li nexweşxaneyê jî stran nivîsin. Vê yekê ez li ser piyan hiştim. Muzîk, derman e.

**“ÎNTERNETÊ,
KARÊ ME HÊSANTIR KIRIYE.”**

Bazara muzîka Kurdî têra te dike?

Helbet bazara muzîka Kurdî, me têr nake lê ka em çî bikin? Ne tenê min, ne bawer im, ti muzîsyenekî/e Kurd jî têr dike. Lê helbet sedemên vê jî gelek in. Problemên me yên polîtîk, sosyolojîk û ekonomîk hene û qeweta me nagihîje van qadan. Lê min dev



ji gazinan berdaye êdî. Derfetên me gelek kêr in, ev jî tesîreke xirab li ser hunera me dike mixabin. Lê şikir înternet heye îro-roj, qenebe em bi riya wê dikarin xebatên xwe bigihînen ber guhdaran.

Tu di vê meselê de sûc naxî stûyê guhdaran qet?

Na, heqê me tu kesî tune ye em ji guhdaran gazinan bikin. Ji ber ku şert û mercên ku me li jor gotin, tesîr li ser wan jî dikin. Car caran ji ber tiştên ku ew guhdarî dikin, em henekên xwe bi wan dikin. Divê em dev ji van tiştan berdin. Lazim e em li xwe vegehin û ji xwe bipirsîn; gelo çima gel muzîka min neheband û jê hez nekir?

“DAYIKA MIN SOPRANO BÛ”

Tarza te ya muzîkê jixweber çêbû an xisûsî te ew afirand?

Bêyî hemdê min çêbû. Ez bi taybetî li pey tarzekê neçûme. Helbet min li ser muzîkê gelek lêkolîn kirin lê muzîka ku ez çêdikim jixweber pêk tê. Senteza motîfên nûjen û etnîk hene di muzîka min de. Carinan hinek guhdar dibêjin, “Ev teqlîd” e lê na, ji ber ku ez di nav wan melodiyan de mezin bûm. Tiştêkî pirr xwezayî ye ji bo min. Dayika min bi xwe jî Soprano bû.



Bi rastî?

Erê, dayika min Navenda Çanda Hunera Kurdî ya Elegezê ya Kirgizistanê vekir û 10 salan ew bi rê ve bir. Ew bi xwe jî dengbêj bû. Dengbêja klasîk a muzîka Rûsî bû.

Bi Kurdî jî gotibû?

Erê ji bo Radyoya Yerîwanê gotibû lê mixabin ew qeyd giş wenda bûne û niha li ber destê me tune ne. Bi taybetî stranên Rûsî gotibûn lê wê bi ciwanên Kurd, govend, stran û kompozîsyonên Kurdî dane fêrkirin.

“HER STRANEK XWEDÎ ÇÎROKEKÊ YE”

Tu stranên xwe çawa dinvîsî, çîrokên hemûyan hene an na?

Ti stran ne bêyî çîrok e. Her stranek, xwe dispêre çîrokekê. Ew tiştên ku min

jiyane, di stranên min de xwe didin der. Ji bo van çîrokan jî hewce nake em berê xwe bidin dereke din, hemû jiyana me çîrok e jixwe. Ez di nav koçberiyê de rabûm, zarokatiya min di wan trênen sar de derbas bû. Tiştên ku em binvîsin, binin ser zimên gelek in. Loma jî her stran xwedî çîroka xwe ye. Mîsal “Lo lawo” ji bo min straneke pir girîng û kûr e. Min ew stran li ser hevjinê xwe nivîsî. Wê demê ez li Parîsê bûm, ew li Stenbolê bû.

We li Stenbolê hevdu nas kir?

Erê, em 3-4 salan ji hev dûr jîyan. Di dûriyê de carinan bêhna meriv zehf teng dibe, di wê atmosferê de min ew stran çêkiribû. Tu dizanî; em carinan evînê ji realîteyê dûr dixin, em wê pirr pîroz dikin. Erê rast e, evîn pîroz e lê heke meriv wê bijî û heqê wê bide. Lazim e mirov ji bo evînê kedê bide.

Beste an gotin, kîjan li pêş e ji bo te?

Herdu jî gelek girîng in lê gotin bêhtir tesîr li min dikin. Ez li ser gotinên stranên gelek serê xwe diêşînim. Gotin ji bo min li pêştir e.

Tu qet fikirî ku rojekê dev ji muzîkê berdî an jî êdî stranên belav nekî?

Na, ji ber ku ez berî her tiştî muzîkê ji bo xwe dikim. Ew ên ku dev jê ber didin, heza wan a li gel vê hunerê kêma bi ya min. Helbet, zor û zehmet û qedexeyê hebûn lê em ê tim û tim stranên xwe bibêjin. Tenê mirin dikare min ji muzîkê qut bike.

Tu stran an jî xebat hene ku dema guh didiyê dibêjî “xwezî min ev çêkiriba?”

Helbet stranên wilo hene ku mirov dema li wan guhdarî dike, dibêjexwezî min ew çêbikira. Ne yek ne dudu, bi hezaran hene. Lê carinan şert û rewş hunerê diafirînin. Loma jî belkî, di ziman û zemanên din de ew kêf û hezê nede meriv.

“EZ Û YASMÎN LEVY EM Ê DUETEKÊ BIKIN”



Tu dikarî ji me re 3 kesan bibêjî ku te zehf dixwest pê re duet bikira?

1- Billie Holiday, stranbêjê pir jêhatî bû. Min dixwest rojekê pê re stranekê bibêjim lê mixabin niha ne li dine ye.

2- Louis Armstrong Trampet jî gelek hêja bû. Min dixwest bi wî re jî kilamekê bigota.

3- Yek ji Yasmîn Levy ye. Ez ji dengê wê gelek hez dikim. Jixwe em hevalên hev in, ez bawer im em ê duetekê pêk bînin. Niha em li ser vê difikirin. Ez vê jî bi riya POPKURD'ê cara ewil eşkere dikim. Bi du zimanan em ê xebateke mişterek bikin ku yek ji zimanan dê bi Kurdî be.

Em carinan keça te Elenya di vîdyoyan de dibînin. Qet “nahewe”, direqse û ji muzîkê hez dike. Gelo dema tu zarok bûy tu jî wisa bû?

Ez di zarokatiya xwe de, ne wek keçikên xelkê bûme. Li gorî diya min dibêje; dema ez 5-6 salî bûm, tim ji jiyana malbatê derveyam. Bajarê ku em lê bûn, wek bajarê Kurdan bû. Li hêlekê Birûkî hebûn, li aliyekî Celalî. Ez li otobusên nav bajêr siwar dibûm, dengê defê li ku bûya ez diçûme wir. Dayika min ez ji dawetan top dikirim. Hertim bala min li ser tiştên wisa bûye.





ME JI 10 KESAN PIRSÎ

Bi ya te muzîka kurdî ya modern bi kê dest pê dike? Bo çi?



YEQÎN H.

Eger qest ji “modern”ê derketina derî muzîka gelêrî û lêgerîna form û derbirîneke nû be, helbet û bêvirdewêde bi hilberîn û bestekariya xwe Mihemed Şêxo destpêka vê xelekê ye..



BÊRÎVAN KESKÎN

Berî ez pirsar we ya derbera muzîka kurdî ya modern de bibersivînim, ez ê fikrên xwe yê derheqê muzîka modern a dinyayê bi çend hevokan bînim zimên. Dahênerî û nûjenîxwaziya mirov, lokomotîva jîyanê ye; tiştên wekî teknoloji, zanistî û hwd. Çi tiştên mirov afirandî û menfeata xwe jênaye nîn e. Herwiha nûjenîxwaziya mirov bandor li ser muzîkê jî kiriyê; muzîk ji qalibê giraniya xwe, ji dengê mirov dihat derxistin, xistin qalibekî awazî, pirdengî û burjuvazî. Li ser

pirsa we; li gor qeneata min, dewrana muzîka modern di muzîka kurdî de bi hunermend Ciwan Haco re dest pê dike. Heke em li heyama muzîka kurdî ya klasîk ên wekî klamên Êrîwanê û Dengbêj Şakiro bifikirin em ê giraniya dengê mirov ê hukmî gotin û awaza dike û yekdengiya amûrî bibînin. Ciwan Haco bi hosteyî û bi awayekî xweser, cure ahengên wekî muzîka Rock û muzîka Jazzê li muzîka kurdî neqşandine. Digel vê yeke; balkêştirin e ku stîla Ciwan Haco ya muzîkê, giredayîbûna wî ya bi dab û nerîtên kurdî ve ye. Herwiha hunermenden wekî Hîvron û Yunus Dîşkaya, bi muzîka modern a li helbestên kurdî û klasîk bêjandine, di navbera ciwanên Kurd û helbestên klasîk ên kurdî de pireke bi stîla xwe ya xweser honandinê.



NECAT ZIVINGÎ

Ez ne mûzîkjen im û ne pisporê mûzîkê me jî. Lê heger weke dildarekî muzîka Kurdî ji min bipirsî dê bêjim mûzîka me ya modern piştî dengbêjan dest pê kiri-

ye. Mîna Mihemed Arifê Cizrawî û Miradê Kinê. Jixwe ku ji Miradê Kinê dest pê bike bi min pir xweş tê. Ji ber ku em hemwelatîyên hev in. Îcar biryar, ya gewreke-man û muzîkjenan e. Rêz û silav û gulav.



RONYA EMEL HEKARÎ

Ger em behsa Muzîka Kurdî ya Modern bikin, hewce ye em pêşî têgeha modern rast û durist rave bikin. Muzîka ku li gor têgihîştin û mercên heyama xwe guncav e, dibe ku hemî gavan ne modern be. Ji bilî vê; muzîka modern ku em ji bo hemî wexta binêrin, dibe ku dijwar be, çimkî her muzîkek, kevna dema pêşiya xwe ye û ya herî modern jî aîdî sedeya me ye. Pêkan e ku mirov di nav hemûyên modern de behsa ya herî kevin bike. Gelek caran stranên nû, dema ku formek rojavayî lê bar bibe, ên modern in. Muzîka modern, têgeha “nû” esseh di nav xwe da vedihewîne; ji ber ku ya modern ji ya kevn wêdetir e û li hember wê bi cih bûye. Dîsa ya modern, têgihîştineke ku di dûmahîka pêvajoyeke dirêj de hatiye bidestxistin, amaje bi hemû kirûyên eslî dike ku di her qada jiyane de diyarker e. Xwedanê pêşbîniya pêşerojê û têgihîştina berê ye. Muzîka modern ew e ku modernbûn daxil kirîye û xwe gihandîye wê. Ji bilî vê, cûreke hunerê an jî berhemeke ku modern be, divê ji bilî nûjeniyê hin taybetiyên dîtir jî hebin û ji aliyê kereste û şewazê ve, ji yên edetî cuda bibe. Muzîka modern, alternatîv an jî bertek e ji bo rêzikên klasîk ên aîdê berê û di van celeb muzîkan da derbirrana şexsî, zêdetir girîngiyê qezenc kirîye. Tam jî ji ber vê çendê; muzîka ku em ê wek “modern” bi nav bikin, muzîkeke ku bi hêsanî

nayê qebûlkin, ji yên berê cuda dibe û hin caran jî ji cureyên ku neyên famkin e. Têgehiştina muzîka modern ku xwe di serê sedsala 20an da nîşan daye, di nîveka sedsala 20an de jî di muzîka Kurdî de ji bo xwe cih dîtiye. Ne wekî şarezaya babetê lê wek guhdarekê ku pêwîst bike fikra xwe eşkerî bikim, Qadir Dîlan, kesê herî girîng e bi min û hunera wî destpêka Muzîka Kurdî ya Modern e. Qadir Dîlan ê ku derçûyiyê Akamedîya Muzîkê ya Pragê ye, stranbêj û bestekarekî muzzem e. Qadir Dîlan, helbesta Dildar Yusuf Ey Reqîb û helbesta Pîremêrd Newroz beste kirine. Xudanê berhemên bêdem û hunermendê gewre ye Qadir Dîlan. Berhemên wî; Firîşte, Sîmfonîya Bo Giyanî Bêkes, Baran Baran e, Kayê Tom Diwa, Ciwanî Bênav, Kilpey Derûn, Ajdehak, Lewanewe Bo Helebce..., mînakên bêhempa yên Muzîka Kurdî ya Modern in. Qadir Dîlanê ku di mijara muzîkê da meraqa wî ya gerdûnî heye û hemû gavan a nûjen cerebe dike, di berhemên xwe da wec ji motifên muzîka xelkê ya tradîsyonel girtiye, axleb ji dubarekirinê revîyaye û girîngî daye teknîk û bikaranîna ahenga bihûrgilî û cih daye guherînên armonîk ên ji nişka ve. Di heman demê da Qadir Dîlan, kemanjenekî gelek sarkeftî ye. Qadir Dîlan ê ku ji dema xwe gelek wêdetir berhem dane, dilsoj e ku têra xwe nayên zanîn û nasîn. Sedema vê jî reng e ku ji çarenûsa a modern û nû qewimti ye. Qadir Dîlan, ji bo wextê wî û demên piştî wî jî bi muzîka xwe ya bêdem ku bi hêsanî nehatiye pejirandin, di wê hêzê de ye ku dê hemûyên nû kevin bike.



MISTEFA DEMİR

Muzîka Kurdî, modernbûna xwe li gorî Ewropîyan piçekî dereng bi dest xistiye. Sedema wê jî bindestî ye. Li her çar parçeyên Kurdistanê, muzîka modern, bi alîkariya biyaniyan dest pê kiriye. Lê piştî ku amûrên bîyanî, Synthesizer û Armonî, bi destê Kurdan hatine bikaranîn modernbûnê dest pê kiriye. Stranên Kurdî yên ku bi destê biyaniyan hatine Armonîkirin û bi riya Orkestrayên cûda hatine lêdan, em nikarin wekî Muzîka Kurdî bihesibînin. Çima? Ji ber ku em Kurd pewist e, van tiştan bi xwe çêbikin.

Karên hevpar ên ku biyaniyan û Kurda pêk ve çêkirine -wekî Ciwan Haco- jî hene lê Albûm û qeydên di destê me de yên ku

tenê Kurdan ew çêkirine nîşan didin ku Koma Wetan li Sovyetê, Koma Amed Li Enqerê û Koma Dengê Azadî li Stenbolê bingeha Muzîka Kurdî ya Modern danîne. Her wiha ji bo Kurdên Elewî modernbûn bi birayên Metîn Kemal Qehreman hatiye avakirin. Di heman deman de li Rojavayê Kurdistanê bikaranîna Biskê (Buzukiya Grek bi sîstema Kurmancî) modernbûneke cûda ye, ji ber ku ew bê Armonî ye. Seîd Yusiv, Mihemed Şexo û Izedîn Temo, muzîkjenên peşeng in. Başûrê Kurdistanê jî bi du astan Modernbûna xwe saz kiriye. Soran, di bin bandora Mûzîka Tehranê de mane, her wiha Bahdînî jî di bin tesîra Mûzîka Bexdayê de bingeha modernbûna xwe danîne. Lê piştî ku Statûya Başûr çêbû, gelek karên pîroz Bi destê Kurdan hatin çêkirin. Orkestraya Silemanî û xebatên Wezaretê Rewşenbîriyê yên li Duhok û Hewlêrê, rê li ber karên gelek baş vedikin.



SEVDA ORAK

Wexta ku dinya diguhere, ango ber bi modernbûnê ve diçe, çi ji aliyê edebiyatê, hunerê, çi ji aliyê muzîkê ve, kurd jî hêdî hêdî ber bi wê guherînê ve diherikin. Muzîka Kurdî ya kevneşopî bi temamî ji holê ranebe jî, guherînên berbiçav tê de xuya dibin.

Ciwan Haco yê ku herdu albûmên xwe yên ewil "Emîna Emîna" û "Pêşmerge" li Sûriyeyê derdixê, ya sêyem "Diyarbakir" û pişt

re "Gula Sor" li Elmanyayê derdixê. Şopên muzîka modern di van albûman de xwe nîşan dide. Him ji aliyê şewaz û vegotinê, him jî ji aliyê enstrumanan ve guherîneke mezin çêdibe. Herçiqaş dev ji stranên gelêrî bernede jî, di stranên wî de jazz, rock, pop û etno-jazz cihekî mezin digre.

Yek ji pêşengên din jî Koma Wetan e ku albûma xwe ya ewil li Sowyetê derxistiye. Ev albûm jî ji muzîka kevneşopî pir dûr e. Bi tarza rockê hatiye gotin. Bi vî awayî, ez dikarim bêjim ku muzîka Kurdî ya modern bi Ciwan Haco û Koma Wetan dest pê kiriye û şopên wan bi muzîkjenên îro jî berdewam dike.



MIZGÎN CANSU

Muzîka kurdî ya modern bi Koma Wetan dest pê kiriye. Ji ber ku cara yekem

mûzîka Rock Koma Wetan gotiye. Keremê Teharê Gerdenzerî, ku kurdekî Êzîdî ye, ji Gurcîstanê ye. Di sala 1976 de komek bi navê Koma wetan ava kiriye û dest bi muzîka kurdî ya model kirine.



ADNAN DILOVAN KEGÎ

Ji ber ku hûn “bi ya min” dipirsin, ez dê bersiveke şexsî bidim. Wekî zarokek di salên 90î de li gundekî Geverê hatî dinyayê, muzîka Kurdî bo min ji aliyekî ve ew bû ya ku dengbêjekî gundî di dîwanên biçûk de digot. Ji aliyê dî, ew stran bûn ku di dawetan de du kesan digot, du kesên din lê vedigêrandin û govend pê dişarandin. Li dû wan, qasetên teyîbê tên bîra min. Ji xeynî yê dengbêjan, qaseteke Hozan Serhad, û xaseten jî strana wî ya

“Hewlêr” tê bîra min, min li ser hev bêyî jêtêrbûn guhê xwe didayê. Pişt re televîzyonên Kurdî malên me şên kirin. Bi wan, me komên salên 90î nas kirin, weki Koma Dengê Azadî, Agirê Jiyana û hemû yê dî. Pê re me ji mezinan zanî ku ewilî bi xêra radyoyên Yêriwanê û Bexdayê muzîka Kurdî digihîşt guhdaran. Pê re me hay ji Ciwan Haco, Şivan Perwer, Nizamettin Arîç û Koma Wetan bû. Dîsa jî ji wan yekî bibijêrim, bi ya min muzîka Kurdî ya modern bi Ciwan Haco dest pê dike. Şêweya wî modern e û muzîka wî bi giştî Kurdewar e. Koma Wetan di malên me de nehat naskirin lê albûma Ciwan Haco ya “Na Na”, li her derî deng veda.



DUYGU ÇELİK

Muzîk gerdûnî ye, dinya diguhere. Di muzîka Kurdî de jî, li gorî van guherînan xebat û lêgerînên nû derdikevin. Helbet guhdarên Kurd jî ji vê bêpar namînin, ew jî li gorî van guherînan li pey tarz û şêweyên nûtir in. Gava behsa muzîka modern a

Kurdî tê kirin, yekser Ciwan Haco tê bîra min.

Ciwan Haco, bi gelek muzîsyenên Ewropayî re xebitiye û li Elmanyayê perwerdeye muzîkê girtiye. Bi tesîra vê; Haco, forma ededî ya muzîka Kurdî bi cazz, pop û rockê re kiriye yek û ji bo muzîka Kurdî perpektîfeke nûjen daniye.

Ganî Mîrzo jî di vê meselê de hêjayî qalîkirinê ye. Tarza Mîrzo ya flamenco-cazzê gelek serkeftî ye.



FETHILLAH ÖZMEN

Bi ya min pirs hinekî aloz e, heke em bêjin muzîka Kurdî, ji bo vê bersiveke min dê nebe. Lewra derbarê dîroka muzîka bi diyalektên din ên kurdî de zêde agahiyên min nîn in. Lê derbarê muzîka bi diyalekta Kurmancî de, dikarim bêjim ku têra xwe xwedî agahî me. Ji ber vê yekê, bersiva min dê li gor muzîka Kurmancî be. Herwiha li gor çarçoveya vê beşê, ez ê bi kurtasî bersivê bidim. Li gor min muzîka

Kurmancî ya modern bi Mihemed Şêxo dest pê dike. Lewra Mihemed Şêxo yekem kes e ku derdên takekesekî anîne ziman. Yanî di gelek stranên Mihemed Şêxo de derdê kesekî/şexsekî hene ku ew kes, ne gelê Kurd, lê tenê xwe temsîl dike. Yanî derdên wî, derdên kesekî zindî û bi xwe ne, bextewariyên wî kesî jî her wisa ne. Di muzîka Kurmancî de xeteke wisa heye ku heta îro jî bi hêz berdewam dike û di vê xetê de takekes tune ye. Her çiqasî stran wekî ya derd û kul an jî bextewariyên kesekî xuya bikin jî, paşxaneya stranê digihije bîra kolektîf a kurdan û temsîliyeta Kurdan dike.

POZHILDANA KURDÎNÛSAN Û BERXWEDANA TIRKÎNÛSAN



USIV
yusuf.enmek@gmail.com

Di medyaya civakî de, bi taybetî jî li ser Twitterê gelek civatên Kurdan hene ku ji hev gelek cuda ne. Îcar di nav wan civatan de komek heye ku ji xwe re dibêjin “Kurdînûs!” Erê, Kurdînûs, ango kesên ku li ser medyaya civakî bi Kurdî dinivîsin.

Herçiqaş hejmara wan ne li gor dilê wan be jî, roj bi roj, çilk bi çilk, dilop bi dilop zêde dibin. (Gene nivîsa wan jî baş bûya dilê me pê nedêşiya)

Kurdînûs kî ne? Çi dikin? Çi dinivîsîn ku ev nav li xwe kirine û wek bizotê êgir di nav civakê de digerin û êrîşî Tirkînûsan dikin! Tirkînûs? Ha em behsa Tirkînûsan jî bikin ne wisa? Tirkînûs jî bi kurtasî ew kesên ku di medya civakî de bi zimanê Tirkî tevdiagerin lê bi eslê xwe Kurd in. Baş e lê ev navê “Tirkînûs” kê li wan kiriye? Dîsa Kurdînûsan ev nav li wan kiriye, an na qet haya wan kesên ku bi zimanê Tirkî dinivîsin, ji vî navî tune ye.

Kurdînûs, timûdayîm qala girîngiya axaftin û nivîsîna Kurdî dikin. Li ser vê mijarê gelek aforîzmayên ecêb diafirînin û dixwazin her kes bi kurdî binivîse. Ma ne mafdar in? Divê Kurd bi Kurdî nenivîsin û nepeyivin lê çi bikin? Bi rastî ez jî wek Kurdînûsekî di wê fikrê de me, ji ber ku zimanê Kurdî di nav bişaftineke otomatik de jan dide.

Li gor min, fikr û ramanên xwe çi dibe bila bibe, lazim e her Kurd li zimanê xwe xwedî derkeve. Carinan li ser Twitterê

tagên Kurdî vedibin, ji parlementeran heta siyasetmedaran, ji rewşenbîran heta nivîskaran, gelek Kurd jî beşdarî wan tagan dibin lê tag jî, parvekirinên wan jî, pesnê wan jî, piranî bi zimanê Tirkî ne. A di wê kêliyê de Kurdînûs weke gurên har êrîşî wan kesan dikin ku bi zimanê Tirkî pesnê Kurdî didin. Ji bo wan ferq nake, hema kî li ber lepên wan bikeve rexne dikin, hele ku ew kes, yekî/a navdar be, îcar hûn ji xwe re werin seyran û govendê. Wekî ku dibêjin “Xwedê ji wan stand!”

Mirov dikare ji van reaksiyonan çend mînak bibêje;

“Birêz parlementer, heta ku hûn pesnê Kurdî bi zimanê Tirkî didin ka ji kerema xwe du-sê peyvên Kurdî binivîsîn, bila em jî ji semîmiyeta we bawer bikin!”

“Yaw ev çi tageke beredayî ye, tag bi Kurdî yê lê ziman bi Tirkî!”

“Yaw qaşo tu parlementer î hê nizanî bi Kurdî binivîsî!”

“daye dünya ğayinê”

“Ger nivîskarên me jî bi zimanê xwe nenivîsîn halê me xerab e.”

Nivîskar: Min qasî tayên porê te bi Kurdî nivîsiye!

Kurdînûs: Diyar e ku te ji bo bazara xwe bi Kurdî nivîsiye

(Qey tu yê bêjî ka ew kitêb bi milyonan hatiye firotan!)

Di vê navberê de, “dm“ya Kurdînûsan jî ji hişê min dernakeve.

Wexta ku ji wan re peyamên taybet tînin jî hema tavilê zimanê xwe diguherînin, ji bin zimanê wan Tirkiyeke akademîk derdikeve. Wilo bi isûl û qayde, “noqtalî û wîrgûllî.”

Car caran jî, heke zanayek yan jî nezaneke li hemberî vê muxtariya Kurdînûsan rexneyekê li wan bike, te hew dît ku hemû Kurdînûs bi hev re li ser serê wan kesan kom dibin û dibêjin “Tu çawa vê rexneyê li me dikî, tu kî yî? (Jixwe di qada şer de kes

kesî nas nake!!) Tu xwe çî dihesibînî? Ma me xirabiya kê xwestiye?!

Bi hezar gotinên nemayî bertekên xwe nîşan didin û wî/ê pêr û perîşan dikin.

Paşê jî yekî mîna min wê derkeve ji wî/ê rexnebêjî re bibêje “De here ha! Tu mêt naxwî!!”

Axirî ew kesên ku bi Tirkî dinivîsîn jî, ji di destê van Kurdînûsên qehrok û pozhildayî de, ta girtine.

Her çiqas ku li hemberî van bertekan, gelek rexne li ser Kurdînûsan dibe jî, Kurdînûs dev ji vê pozhildana xwe bernadin. Ew kesên Tirkînûs jî, li ber xwe didin û dîsa bi Tirkî dinivîsin.

Divê mirov tiştên baş jî paşguh neke! Carinan hin parlamenter jî dibêjin, ez ê êdî bi zimanê xwe binivîsim. Berî niha çend caran tiştên wisa qewimîn û pit kêfa me hat. Li gor hin kesan dibe ku meseleyeke basît û ji rêzê be lê ji bo me ev, pir girîng bû.

(Ji bo me, em, yanî Kurdînûs)

Di mijara rexneyan de meseleyeke din jî heye ku dibêjin “Kurdînûs pozbilind in!” Yaw wan pozê xwe hildaye ma wê çawa pozbilind nebin? Ji ber ku Kurdînûs gelemperî dikevin şopa kesên ku Kurdî dinivîsin û yên ku Tirkî dinivîsîn naşopînin, feqîrê Tirkînûsa jî dibêjin Kurdînûs qurre û pozbilind in.

Bi rastî di rewşeke wiha de ku tişteki mirov pê pozbilind be tune ye, ma kîjan millet bi zimanê xwe nanivîse? Ka bêjin? (Biborin yaw, min xwe ji bîr kir, kurd nanivîsîn) Kîjan millet bi zimanê xwe pozbilind dibin gelo? Bi min Kurdînûs ne pozbilind in, pozhildêr in. Li hemberî wan kesên ku li zimanê xwe xwedî dernakevin û yên ku qenebe li hemberî vê bişaftinê bi nivîsandina zimanê xwe wek bersivê bi kar naynin re, pozhildêr in!!

Eger mirov ji aliyê rûhî ve li vê hêrs û qehra Kurdînûsan binêre mirov dikare bibêje ku ew, şewata dilê xwe derdixin,

loma jî ew qas hêrsok in.

Îtîraf dikim, carinan hîn kesên ku li ser Twitterê nû ne, ji min re jî peyaman dişînin û dibêjin “Tu çima min naşopînî?” Dû re ez bala xwe didim ser hesabên wan ku parvekirinên wan bi Tirkî ne, ya rastî bêjim ez jî qet bersivê nadim wan.

Ya ku tê bişaftin zimanê Kurdî ye, divê em li hemberî vê asîmîlasyona dijwar him serî hildin û him jî poz hildin, bi zana û nezanan, bi keç û xortan, bi parlamenter û siyasetmedaran, bi nivîskar û hunermendan, nexasim jî li ser înternetê em zimanê xwe bi kar bînin. Çi dema ku ez li ser meseleya zimên dûr û kûr difikirim, ev gotinên birêz Fawaz Husên tên bîra min:

“Em bi mîlyonan bûn

Me dikarîbû çiyayê bilind bihêjandana

Me dikarîbû bi mîza xwe lehî rakira

Lê,em bê hiş bûn

Me xwe li tixûbên nenas

Li çareserkirinên erzan girtibû”

Ma neheq e Fawaz Husên?

Eger em veşerî ser mijara xwe ,ger ji min were pirsîn, ez bi xwe li dij peyva “Kurdînûs”iyê me, gerek ziman tu wextî nekeve bin bandora tevger an komekê, divê ziman weke kitêbeke pîroz di teqeya mala me de neyê daliqandin, lazim e zimanê Kurdî dakeve bazaran û pê pere bê qezenckirin, pê danûstandin bibe, pê kar û xebat bîn meşandin. Ziman wî wextî pîroz û biqîmet be.

Her wiha,ziman ji bo hin kesan her tişt e

Ji bo hin kesan jî tu tişt...

XEM Û EDEBA KURDÎ



RONYA

Sedema paşketina çîrok , roman û helbesta kurdî vedigere ser rewşa aloza kurdan ku bi serbûrên nexweş de derbas bûne bi dirêjahiya dîrokê de .

Dema mirov şehrezayê edebiyata kurdî dibe bi her devokekê û li her parçeyek ji Kurdistanê mirov hest bi cudahiyê nake ji ber ku hemû jî yek mijar bûn ew jî rewşa wan serdema bûn yên ku kurd pêre derbas dibûn , di vê navberê de ziman jî zirar dîtiye .

Li bakur di serdema Osmaniyan de Kurdan ew derfet hebû ku bi zimanê xwe perwerdehiyê bistînin , heya şerê cîhanî yê yekê ku komara tirkîyê ava bû .ji ber rewşa siyasî kurdan nedikarî perwerdehiyek baş bistînin bi zimanê xwe .

Li başûr jî rewşa ne xweş û ji ber şer xwendin bi nîve dima piraniya xelkî tevî şer dibûn , yên ku dinivîsandin piranî ew bûn ku li çiya diman û li ser xebata xwe û rewşa wê çaxê dinivîsandin ûgiringî ya ziman zêde nebû .

Li binxetê jî her wisa bû lê rewşa ziman baş bû di bin bandora kovara Hawar de bû û pêşketî bû .

Li rojhilat jî edeb pêşketî bû medrese û xebat gelek hatin kirin lê li dema serhildana komara kurdistanê ya Mihabadê de ziman

û edebiyat zêdetir hat berçavkirin lê gelek dirêj nekir ji ber sedemên siyasî . Li her çar parçeyên Kurdistanê ji ber bandorên hikûmetan gelek caran derbirînên wan bi awayekî remzî bûn piranî jî xem û kulên Kurdan nîşa didan , ku ev jî ji aliyekî baş bûye wek dîrokêkê hemû hatiye nivîsandin , dema helbestên berê dixwînîn dibe ku helbest wek evîna dinavbera du evîndara bê fêhm kirin lê bixwe helbest ji bo evîna welat bûye ku bi awayek veşartî yan ku remzî hatiye behis kirin ji bo mînak dar berû wek remzek ji bo xweragirî ya kurda dihat bikar anîn hesip wek remza şoriş û berxwedanê bû kotir nîşana aştiyê ..û gelekên din . Hinek ji wan helbestan bûne sitran û sitranbêj hebûn wek Tehsîn Taha , Erdewan Zaxoyî û gelekên din bi awayek remzî sitran digotin ji ber serbest nebûna derbrînên xwe .

Dema nivîser ji welat derdiketin , azad dibûn ji derbirîna hestên xwe lê piraniya wan jî dîsa rûyê şin û giriyê xuya dikir , ev jî bû sedema wê ku edebiyata kurdî tenê li ser rêçekê biçu . Lê hebûn jî ketin bin bandora edebiyata biyanî û dest bi nivîsa tiştên nû û cûda kirin , yên ku xwestine bi awayek nû û cûda binivîsin serkeftî bûne û piraniya wan berhemên nivîsarên navdarên biyanî wergerandin kurdîyê û wisa giringiya ziman jî peyda bû .

Lê heya niha bandora xem û kovanan di berhemên nû de tê dîtin ew jî hê di bin bandora berê de maye . Dema mirov nerênî jî lê binêre erê dibe ku zirarên wê jî hebin ku edeba kurdî pêşnekeve ji ber ku niha jî dema mirov berhemên nû dixwîne piranî yek mijarin ev jî dibe sedema wê carna xwendevan ji xwendina wan biwestin taybetî ciwanên nûdem ku ji dúbare bûne bêzarin , erênî jî dema lê difikirî ewe ku elaqa neteweperwerî yê li cem xwendevanan zêde dike .

Travma û Vîrusa Koronayê



Prof. Dr. Jan Ilhan Kizilhan

Travma, birîneke derûnî ye. Piştî ku teşqeleyên xedar û giran tên serê mirovan, însan dikevin nav tirseke mezin û êdî nikarin wek berê bîjin. Jiyana însanan bi civakî û şexsî tarûmar dibe. Ev mirovên xwedî travma, di hundirê xwe de êdî ne azad in; li dijî xwe û derve, gelek bi agresyon, nefret û tirs in. Rihetiya xwe nabînin, mejiyê wan her dem bi vê tirsê meşqûl e, xwe li dijî herkesî diparêzin, an jî ji ber ve tirsê pergala wan a xewê xirab dibe, fikr û hizirên negatîf zêde li wan peyda dibin. Mirovên ku beriya vîrusa koronayê xwedî nexweşiyên derûnî bûn, vê demê semptomên nexweşiyê li wan zêdetir dibin. Mirovên travmatîze, zêdetir ditirsin û dikevin nav metirsiyeke mezin; bê ka siberoj dê ji mirov, malbat û civaka wan re dê karaseteke nû bîne, ka dê mirov an jî neferên malbatên wan, ji ber vê vîrusa koronayê bimrin an na. Ev pirs, mêjiyên wan tim meşqûl dike.

Nexweşiya travmayê, ne tenê mirov an jî şexsekî dorpêç dike, herwiha civak an jî miletek jî dikare têkeve bin bandora travmayê. Ev yek, bandoreke mezin li ser qada aborî, civakî, çandî û polîtîk a miletekî dike. Her gavavêtin, biryardayîn, li ser bingeheên tirsê û bêbaweriyê, bi zehmet tên kirin. Bêbaweriyê ji xwe û serkirderiyên dewletê, nahêle ku ev însan qerarên rind bidin. Biryarên bi mantiq û rasyonel kêr dibin, hest, nefret û tirs, bandor li ser dîtin û têgihîştina dinyayê ya mirovên travmatîk dike.

Bi taybetî travmayên Kurdan jî ne ewqas sivik û kêr in. Kurdan, di dîrokê de, çî bi şexsî û çî jî civakî pîr tradejî, kuştin, penaberî, hingavtin dîtine û hê jî van tiştan dijîn. Bi aloziya vîrusa koronayê re, travmayê kevn şiyar dibin û tevî travmayên şexsî yên îroyîn dibin. Tîrsa jidestdan an jî mirina mirovên nêzî van însanan, baweriyê wan dişkîne, hêviyên wan qut dike û bi vî şiklî, nexweşiyên derûnî li wan kesan peyda dibin an jî zêde dibin.

Pandemiya vîrusa koronoyê, ji nişka ve hat û tu kes ne amade bû ji vê rewşa giran re. Wekî brûskê, wekî tofanê li dinyayê belav bû. Her roj di nûçeyan de hejmara mirovên bivîrûsêketî an jî mirî zêde dibin û heta niha ti dermanek ji vê şewbê re nehatiye dîtin.

Rewşa malbatan di dema vîrusa koronayê

Ev tirs û xofên ku me li jor qal kir, tesîr li ser zarok û ciwanan jî dikin helbet. Bi taybetî heke di malbatekê de dayik û bav xwe bêçare, xemgîn û bitirs hîs bikin, ev yek bandoreke mezin li ser zarok û ciwanan dike. Li van zarok û ciwanan êdî tirs, bêbawerî û xemgînî peyda dibe. Ev yek jî rê li ber vedike ku ji psîkolojiya wan têk biçe. Dayik û bav, divê bi zarokên xwe re rûnên û bi wan re li ser vîrusa koronayê û bandorên wê rasterast biaxivin. Zarok hewceyî pêwendî, bawerî û hêviyê ne. Zarok, bi hêz û quwet in, lê divê mirov bi alîkariyê, vê hêza zarokan xurttir bike; nexasim jî di demên karesatan de. Malbat divê jiya-

na xwe -çiqaş zehmet be jî- bi rêk û pêk bimeşîne.

Ma gelo dermanê vê travmayê heye?

Em di van rojên dawî de dibînin ku Kurd, li her derê cihanê piştgiriya ji bo xelkê xwe diyar dikin. Ev tiştêkî pir giring e. Ev peyama “hûn ne bi tenê ne”, ji bo domandina jiyanê, di van rojên xedar de pir giring e.

Herdem wiha ye: mirin, êş û tade mîlet nêzîkî hev dikin. Dost û dijmin ji hev cuda dikin. Ji bo siberojê jî, di van demên giran de perspektîfên nû derdikevin.

Ji lêkolînên tenduristî û psîkolojiyê, êdî em dizanin ku mirov, yanî her şexs xwedî hêz û derfet e. Ev, derfeteke xwezayî û binyatî ye. Heke mirov zanibe van hêz û derfetan bi kar bîne, mirov xwe bi xwe dikare piraniya aloziyan derman bike. Bi serkeftina li dijî aloziyan mirov û civak, dibin xwedî tecrubeyên nû û mirov (şexs û civak) pê mezin dibin. Herwiha, mirov bêhtir rêzê ji xwe û ji mirovên din re digre.

Bê guman ev nayê ve wateyê ku ev tradejî dê werin jibîrkirin. Nexasim mirovên ku xwişk û birayên xwe, dayik û bavên xwe, zar û zêcên xwe ji dest dane, tu car dê bûyerên bi vî rengî ji bîr nekin. Lê dê bi piştgiriya civaka xwe karibin bijîn, ji ber ku di vê dema tarî de, hêviyek heye ku tim rê ronî dike. Li hemberî semptomên nexweşiyê û negatîfizmê, derfetên dermankirin û pozîtîfizmê dikarin di nav civakê de wekî kulturekê nû werin çandin.

Jiyan her dem xwedî wate ye û divê her dem bi wate bimîne.

